


# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÈN KURDISTANÊ LI SWËD



**BERBANG**

Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet. Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Tigris  
Layout och sättning : Cotkar och Gundi.

**ADRESS**

Kurdiska Riksförbundet Rissneled  
ed 55, NB  
172 44 Sundbyberg/ Sweden

Prenumeration: Medlemmar 50 kr.  
/ år övriga 100 kr/ år  
Postgiro: 643880-8

**BERPIRSİYAR :**

**A. TİGRİS**

**REDAKSİYON:**

**BAVĒ NAZĒ**  
**S. QERECDAX**  
**C. ŞERO**  
**MUĒYID TEYIB**  
**BRİNDAR**  
**ADIL DURAN**

**PERGALA RÜPELAN:**

**COTKAR ÜGUNDI**

**BERBANG**

Kovara kurdi, xwedi: Federasyona  
Komelên Kurdistanê li Swêdê  
Biha: 5 kronê swêdê  
Abone: sal 50 kron

**NAVNIŞAN**

Berbang, Rissneleden 55 NB  
172 44 Sundbyberg/ Sweden  
Postgiro: 64 38 80-8

# **NAVEROK**

Li ser wêje û ziman	.....3 -4- 17
PANELEK	.....
DÎTINEKE KURT LI SER KURDÊN LUBNANÊ	.....5-6- 7
	Azad Serbest
ŞEWIRMENDÊ DEWLETA TIRK	.....8
DÊ KÎ ZENGIL DI HUSTÊ PISİKÊ XE?	.....9
	Bavê Nazê
JI BO DESTÛRÊ PÊŞNEYARI	.....10 -11
	Komîta Koordîne
BERBANG Û ŞEVA ZAROKAN	.....12-13-14-15-16
	A. Tigrîs
JI FEDERASYONÊ Û KOMELEN ENDAM NÛÇE Û BÜYER	..18
ROMATA " TU"	.....18
	A. Fewzi
DENGÊ ME	.....18
Jî helbestvanê kurd	
AHMEDÊ NALBEND	.....20-21
	Muêyid Teyib
FERHENGOKA BERBANGÊ	.....22
Li Hollandê	
NAVENDIYA KURDISTANÊ VEBU	.....23

# li Ser wêje û ziman

## PAÑELEK

Redaksiyona Berbangê, di roja 21. 21. 1985 an de bi hinek niviskarêñ kurd re li bajarê Stockholmê panelek pêk anî. Babeta panelê li ser ziman û wêja kurdî bû. Pir-sen panelê ev bûn:

- 1- Hun rewşa rojnamegeriya kurdî li Ewrupa çawa dibîn û ji bo pêşvebirina wê, bi taybetî di warê ziman de ci pêwîst dibînin?
- 2- Bi nêrîna we romana kurdî heye an tune ye? Heger heye hun çawa dibînin? heger tune ye sedemên tunebûna wê ci ne?
- 3- Nêrîna we li ser efrandinêñ niviskarêñ bi nîjad kurd in û bi zimanê bîyanî ew dinivîsinin ci ye?

Endamê redaksiyona Berbangê Bavê Nazê, panelê i-dare kir. Bavê Nazê, him bi xwe besdarê guf-tegoyê bû û him jî civînê dagerand. Ji bil Bavê Nazê ev kes besdarê panelê bûn:

Rojen Barnas, Ferhat Şakîlî, Mehmed Uzuri, Reşo Zilan û Malmisanij.

Em niha li jêr bi kurtî guftûgoya panelê ji we xwendevanen xwe re ji pêşkes dikin.

Berpîrsiyarê panelê Bavê Nazê, civînê vekir. Di derba-re civînê de agahdarî da. Pir-sen panelê xwend. Qala gelş û pirs û pirsgirikêñ wêje û zimanê kurdî kir. Û ji Reşo Zilan pirsa xwe ya yekemîn kir:

— Di zimanê kurdî de gelo çima kumik tê bi karanîn?

Reşo Zilan : Di her zimanî de qanûnêñ taybetî hene. Bingehê alfaba kurdî bi kumik hatîye danîn; lê dema M. Kemal alfaba tirkî guhart, Celadet Bedirxan jî di alfaba xwe de hinek guhartin çekir û alfaba xwe nêzî ya tirkî kir. Lê dengdêr cûda man "î" ya kurdî dirêj û ya tirkî kurt e....

Rojen Barnas : Di dema Osmanî de ji "î" bi kumik bû. Di dibistanan de ji mamostan ferqiyata "î" ya tirkî û ya İranî şandidan....

Bavê Nazê : Di daçekan de tu çawa difikirî?

R. Barnas : Ev pirsekî siyasi ye. Dema merkez hebe, ew çax dibistan, radyo û tv li gor wê tê meşandin. Bedirxan û Qanatê Kurdo li derê welat vi işî meşandise. Heta Celadet sax bûye, Osman Sebrî, Cigerxwin û yên din li gor wî nivisandine; lê di pey mirina Celadet de her kes li gor xwe dest bi nivîdandinê kiriye. Celadet li gor Ewrupayê nivîdandiye. Divê em li gor grametika Celadet bimeşin. Lê këmasiyen wê ji hene.

Reşo Zilan : Di rastnivîse de, ferqen mezin di nav Celadet Bedirxan û Qanatê Kurod de hene. Qanat tişteki nû derxistiye, lê Celadet wê nedîtiye. Ew ji rewşa 5 halêñ ziman e. Qanat dibêje 5 halêñ zimanê kurdî hene. Kurdêñ Erivanê daçekên pêşin nanivîsin. Wekî "mi ra" (rasti ji min re ye). Di zimanê Ewrupayî de ji bo daçekan qanûn hene. Zimanê kurdî ji di vi grubê dê. Zimanê kurdî ji divê li

gor wê be. Divê di kurdî de ji daçek cûda bêñ nivîsin. Bi xwedê divê mirov bala xwe bide zaravayêñ din ji. Bi taybetî divê mirov bala xwe bide sorni. Divê em prensi-bêñ Celadet biparêzin

Bavê Nazê : Dibêjin ku tirk lêkera "bûyînê" bi hev re dinivîsin, ji ber vê yekê ji, Celadet cûda nivîsiye. Heval Malmisanij, tu ji vê dîtinê re dibêji ci?

Malmisanij : Her ziman xwediyê mantıqekî ye. Ev tiş tiştêñ formel in. Ji aliye teknikî ve kîjan hêsaye û adetêñ berê ji divê mirov bide domandin. Divê em riya Celadet Bedirxan nasbikin. Tip ji formel e. Wek reşo ji baskir di-vê li gor C. Bedirxan be.

B. Nazê : Tu dibêji em şâşiyen Hawarê ji binivîsinin?

Malmisanij : Na. Ez dixwazim li ser "î" û "î" bisekinim. Me li Tirkîye, 'î' ninivîdandin ji ber ku li wir "î" dahatîn nivîsandin.

B. Nazê : Reşo dibêje "î" ne formel e.

Malmisanij : Mirov nav û deng dide tipê. Tip bi xwe nav û deng nade. Hinek dibêjin "ke" û hinek dibêjin 'ka'. Di destê mirov de ye.

Reşo : Lêkera 'bûn' Qanat dibêje, ji 'hebûnê' hatiye. Dibêje ku du gotinan dide ber hev û divê cûda bê nivîsandin. Lê "bûn" di zimanêñ din de ji cûda ye. Her-weha di zimanê ewrupayî de ji....

M. Uzun : Divê em du tiştan bidin ber xwe. Armanc û yekîtiya ziman. Di warê kurmancî de C. Bedirxan him avêtiye, lê standart peyda nebuye. Divê di vi warî de yekîtiya ziman çêbe. Min bi xwe destnivîsarêñ ku C. Bedirxan re hatine dit. Ji aliye ziman ve cûda cûda hatine nivîsandin, C. Bedirxan hemû rast kiriye. Ez dibêjin C. Bedirxan rast e. Di vi warî de instituya Kurd qerar girt. Divê hemû rojnameyêñ kurd ji xwedî qerar bin. Du avantajen C. Bedirxan hebûn. 1) Ew di nav gel de bû; 2) ewguh di-dan zimanê ewrupayî. Cûdabûn ne ji bo tirkîye, li gor zimanê ewrupayî ye. Divê standart hebin. Her kesê ku binivîsine ne ziman zana ye. Heta niha mele û seyda li ser ziman xebitîne. Iro divê zimanzan vi karî bikin.

B. Nazê : Di kovara Hêyi de gotarek heye, dibêje ku di kurdî de zaravayê edebî tune. Iro du zaravayên ser-ke hene. Çawa çêdibe, gelo Şakîlî dibêje ci?

F. Şakîlî : Yekbûna zimanê kurdî gelek çetin e. Iro Kurdistan di nav 5 dewletan de hatîye dagirtin. Iro ew xelkêñ ku bi ziman mijûl dibin ew ci kes in? Ew kesen ku divîsin ne ziman zana ne. Bi taybetî ew kovarêñ ku bi kurmancî têt nivîsin ne kurmancî ye. Di % 80 gaş in. Mesele lengus-tîk rast e an na. Du diyalekt hene. Iro çiqas her du diyalekt paralel ji herin yekîti pêk naye. Di esasen xwe de zimanzanayêñ ewrupayê dixwazin ferqiyeta naybera her du diyalektan mezin şan bidin. Lê ne ewha ye. Iro problemen zimanê norvejî ji hene. Norvejî di yekîtiya ziman de 3 tiş dibînin 1) masmedia; li Kurdistanê nîn e 2) her kes wek bav û diya xwe dinivise, Diyarbekirî, Silêmani.... Ji ber vê yekê her nivîskar li gor devoka xwe dinivise. 3) Aqedemiya central hebe. Aqedemiya Norvejî, ji aliye gramefîk ve ji yekîtiyê aniye. Divê yekîtiya zimanê kurdî ji hebe. Central pêwîst e. Hawar ne standart e. Qanûn nîn e. Divê em bêjin 'belê C. Bedirxan çewt e.' Divê ne li gor gotin û nivîsandina Qanatê Kurdo be ji. Divê her tişti bi zanistî be.

Malmisanij : Ez dixwazin tişteki kurt bijim; şâşiyek heye. Zimanê kurdî hemû diyalekt in, hun dibêjin; lê ji aliye din ve hun zazakî ji ji bîr dikin. Nizanim çima? Ez iddia dikim, ew kurdêñ ku iro bi dimili dipeyvin qasî kurdêñ İraqê ne. Kî çiqas li ser zazakî xebitî ye? Li derî zazakî dê çawa yekîti çêbe? Me, bi zazakî ferhengek çekir lê bo ne çapkirina wê gelek problem derxistin, ne hate çapkirin. Zaza di dîroka Kurdistanê de roleke mezin lis-tine. Çima di hêla ziman de na?

B. Nazê : Ger nivîskar li ser bingehê gramerî ninivîsin de yekîti çêbe; divê babetê de nivîskarêñ li Ewrupa wek hev dinivîsin. Erê Mehemed lê roman çima bi devo-kî bêt nivîsandin?

M. Uzun : Di kurmancî de zimanê edebî tune. Kurmancî û zazakî diyalektên (devo kîn) peyvîne. Divê em zimanekî edebî pêk bînin. Divê ziman di çarçova edebî de bi kar bê. Di vir de em ji soranî û zazakî keliman bigrin. Ez piştgiriya Malmisanij dikim, divê ew zaravayê xwe bi kar bine. Divê hemû devok derkevin navê. Bi hemû devokan zimanekî nivîsê pêk bê; lê ne di wê manê de ku xelk ji wê zimanê nivîsê fam neke.

B. Nazê : Nivîskarekî rûsi rojekê ji me re got ku; "ger ez kurd bama, min dê li ser dîroka kurdî binivîsan. Lê niha ez li ser ya rûsi ci biniwîsim. Her tişt hatiye nivîsin. Hun xortin karin gelek tiştan binivîsin...." Wek em pê dizanîn, Mehmed Uzun ji romanek nivîsi ye. Te cima ji esera xwe re negot çiroka dirêj, te got roman?

M. Uzun : Roman di edebiyata her miletî de besêk e. Pivanê romanê ji hene. Roman ji çirok, piyes û ji yêncûda ne. Pivan ew e, ku ne awakî vekirî an ji zuha be; ne tarîh û ne destan be ji. Lê divê ev tişt têde hebin. Şexsi-

yet û bûyerên tarîxfî, civakî, kulturî bi şexs ve bêne girêdan. Tesfirê edebiyêne dirêj têde hebin. Roman pişta xwe bide tore û norman.....

B. Nazê : Tu dixwazî bêji ne siyasi be, tarîhi be?

M. Uzun : Roman tişteki gelek fireh e. Ez.....

R. Barnas :: Roman bi serê xwe tarîh e.

B. Nazê : Şexis di çirokan de ji hene. Tasfirî ji....

M. Uzun : Hikaye heye di wan de her tişt hene. Di hikayê (di çirokê) de konstrasyon bilind e. Di roman de kultur, psikolojik di firehî ya wê de hatiye raxistin. Mam...

B. Nazê : Tesfirê edebî, di wênen edebî de ji hene. Sûret dikeve hemû cûrên edebî?

M. Uzun : Mesela du sed sal heye, ku li ser romanê hin munaqeşe dom dike. Dikare li ser destanekî romanek bê nivîsandin. Baweriya min divê şexs têde hebin, şexs di jîyana xwe ya rojê de hinek pirsan çêke, ne awayê dersane. Wek awayê jîyanê. Ev di tarxê de tune. Roman berhemek e kapitalizmê ye. Bi vi awayî roman derketî ye.



Kêm-zêde divê di romana kurdî de ji ev tişt hebin. Romanâ ku em dibêjin roman e!

F. Şakîlî : Hinek heval dibêjin hîkaye. Kurdêñ jêrîn dibêjin çirok, kurteçirok... Di sedî de sed tarîfa romanê tune ye. Ne li gor şexs e. Ronam heye ku şexs tê de gelein, roman heye şexs kêm in. Ji aliyê rûpelan ve ji weha ye. Roman heye çend hezar rûpel digre û roman ji heye pênc (5) rûpel e. Divê munaqeşe li ser roman heye an tune ye be.

B. Nazê : Divê berî her tiştî em zanibin roman ci ye. Heta iro M. Uzun, M. Baksî û Brîndar roman nivîsandine.

Divê em baş bizanibin roman ci ye... Divê mirov roman, çirok û kurteçirokan tevlî hev neke. Ulemayê Sovyet li ser sê şiklan dissekinin. 1) lîrik; 2) drema; 3) epêher yek ji wan ji şaxen wan hene. a) romana epros..... b) powist - çiroka dirêj û kurteçirok c) novel. Weha ne be nabe. Roman, çirok û kurteçirok tevlî hev dibin. M. Uzun : Roman girêdayiyê xwendevanan e. Ev tişt ne muhim e. Hinek karin bêjin çirok, hinek karin bêjin kurteçirok û hinek ji karin bêjin roman...

B. Nazê : Na, na divê em baş bizanibin.....

Malmisanij : Rast e, divê li gor roman pîvan hebe. Roman

# DİTINEKE KURT LI SER

## KURDÊN LUBNANÊ

*azad ahmed*

Azad Serbest vê nivîsara xwe ya ha, bi erebî nivîsî bû.  
RÊBER, nivîsarê ji zimanê erebî wergêrand kurdî.

Qasî 80 hezar kurd li Lubnanê ji demeke dûr û dirêj ve meçhul in. Kes bi temamî bî rewşa wan nizane. Bi rewşa wan a însanî, civakî, zanistî û siyasi ne agahdar in. Ne cîcaka Swêd tenê, di nav wan de grûbêñ Kurdistanê ji hene; ku ne agahdar in rewşa kurdêñ li Lubnanê ne. Ji ber vi sedemî ji min pêwîst dît ku bi kurtî vê agahdariyê bigîhînim kovara federasyonê Berbangê. Ev gava yekemin e, ku kurdêñ li Lubnanê yêñ meçhul bide nasandin. Dîroka kurdêñ li Lubnanê, dîrokekî dûr û kûr e. Di sala 1200 ì de hinek malbatêñ kurd hatine Lubnanê. Ew malbat bi plan û dekêñ dewlemendiyê hatin Lubnanê. ( Eyubî, Al-Seyfî, Murebî, Canpolat, Al- Îmad, Malbata Hamê û ûhw...) Sedemîn hatina wan malbatan û li Lubnanê, rewşa wan ya civakî ya wê demê bû. Ji xwe di dema Eyubî û Osmaniyan de sînor tune bû. Kurd li erdê ku iro jê re dibêjîn Lubnan ciwar bûn û ji bo parastina heremê gelek xebat şandan. Kurd ketin nav civaka Lubnanê û di nav meselên wê demê ya hundîri de rolekî wan yê aktif, baş hebû. Bi taybetî dî dîroka Lubnanê ya navîn û nû de. Ew dîrok ji, dîroka hemû lubnaniyan e. Mayîna kurdan bi sed salan li Lubnanê, kurdan kir lubnanî ji ber ku ew çax mesela netewî tune bû.

Mirov kare bêje, pêk hatina civaka kurd li Lubnanê, di pey qetliama Ataturk de ew kurdêñ ku ji Kurdistanê Tîrkiyê reviyan li Lubnanê pêk hat. Li pey gund şewtandin, kuştin û qetliama mezin hinek kurd mecbûr man ji Kurdistanê reviyan û xwe avêtin Lubnanê û bi taybetî berî 60-65 salan li Beyrutê ciwar bûn. Têkiliyên wan bi welêt re dom kir û ji ber vê yekê kurdîtiya wan winda ne bû. Adet, kultur û zimanê wan wek yêñ bay û kalêñ wan dom kir û di vi warî de alîkariya tû kesî û sazgehî negîha wan. Her wiha kurdêñ li Lubnanê bi şîn û şayıya neteweyê xwe re bûn.

Ez karim bêjîm rewşa kurdêñ li Lubnanê di navbera 60-65 salan de bi awakî zanistî guhartineke mezin û berçav çê nebû. Ji ber ku rewşa wan a koçerî dom kir û ciwar bûneke daimî pêk nehat; civaka wan nezan, nexwend û xizan ma. Û her wiha civaka kurdêñ li Lubnanê, ji civaka Lubnanê cûda û der ma. Ew paşve mayîn, nezanî û xizanî ji jêbermayiya (mîrasa) koloniyalistên tirk ma. Ev tiştana bi wan re hat heta Lubnanê ji. Wek berê ji min got, iro ji

di jîyana civaka kurdêñ li Lubnanê de guhartineke gelek mezin çênebûye. Iro ji li Lubnanê, xaniyên wan wek xaniyên welat in. Karêñ ku li welat dikirin li Lubnanê ji dîkin. Kurdêñ li Lubnanê karêñ herî giran dîkin. Wek, tri-firoş, piştîkêş, barhilgir, rencher, emele û hw... Kesêñ xwendekar, pispor gelek kêm in û ji tiliyên destekî zêdetir nîn in.

Bi kurtî mirov kare bibêje, di vê dema dûr û dirêj a ku li Lubnanê di ser kurdan re derbas bû hîn jî kurd di tepe repa xizanî, nezanî û bê ciwariyê û bi her rengê derd kişandinê de mane. Heger ku pêşveçûnek hebe, pêşveçûneke pir hindik û biçûk e. Li gor pîvandina teori û pratîk û di dema dûr û dirêj ku li Lubnanê mane; di jîyana wan a rojê de, karêñ wan yêñ giran hemû ji bo pariyek nan e.

Sedem ne ev e, ku ev nezanî, xizanî û paşvemayıya kurdêñ li Lubnanê ji dinamîka kurdan tê. Belê sedema herî giring û mezin ev e, ku kurd ji aliye fermî û gelêrî ve û ji aliye civaka Lubnanî ve nehatine qebûlkirin.

Dema ku kurd ji Kurdistanê ji ber zilm û zora netewî û çinî reviyan, hatin û li Lubnanê ciwar bûn; tê wê manê ku Lunbabîyan wan wek grûbeke multeci qebûl kir. Divê civaka Lubnanê, ji wan re alîkari bikira û wek zarokekî nû ku li ser lingan dikeve, divê mirov destê wî bigre û alîkariya wî bike, ku karibe bimeşe. Bi rastî ev alîkariya wiha li Lubnanê ji grûbêñ multeciyêñ din re bû. Wek grûbêñ ermenî, suryanî/ aşûrî û yewnanî. Peymana 1943 ya, sistema dewleta Lubnanê çêkir. Ew peyman a li ser menfaata grûbêñ dînî pêk hat.(1) Ev sistema nû dît, ku ew grûbêñ multeci xizmeta menfîata wan a çinî dike. Hêzêñ karbîdestêñ Lubnanê, ji bo demen pêş û xurtkirina karîna xwe destek û alîkariya wan grûban girtin. Û bi vi awayî ji, ji wan grûban re rê û imkanen nû vebûn, ku civaka Lubnanê ya grûbî û mezhebî xurt bikin. Lê ev ûmkan ji kurdan re çênekirin. Ew kurdêñ belengaz, tenezar ku li Lubnanê bûn, bê par û bê kes man, ew rewşwan hîn ji dom dike. Lê ew grûbêñ ku ketin nav sistemê û ji her alî ve alîkari û piştigiri girtin, sewiya wan a civakî, kulturi û siyasi gelek bilnd bû û pêşket. Hemû grûban (derê kurdan) mafen xwe yêñ hemwelatiyê (wetandaşiyê) bi hêsanî girtin. Ji zarokêñ wan re deriyêñ dibistanan, (dibistan li Lubnanê bê pere ne) ûtevê nexweşxanan, doktoran û klinikan belaş vebûn. Ji



Ji bo hemwelatiyê gîfgotinek  
ji serokwezirê Lubnanê re.

Qeyd û ders

bil wan tiştan, derî û imkanen salonen sporê, çapxanan, koma ciwanan ûhw... vebûn.

Ez dixwazim di vê babetê de mîsaleke kurt û biçûk bîdim.

Di roja 16. 11. 1942 an de rojnama lubnaneyê "Al-Nîhar Al Lubnaniye" daxuyaniyeke wiha diweşand; " 10-28 . 11. 1942 yan de komîtek ji jînê Lubnanê pêk hat. Komîte ji her malbateke lubnani daxwaz dikir ku her yek qalibek sabûn û qalibek kek bişeyîne ji bo alîkariya multeciyen yewnanî û yê din."

Lê, di wan deh salan de tiştê ku rojnamen Lubnanê, li ser rewşa kurdên li Lubnanê weşandiye ji derê nûçe-qerfekî ku ew jî, ji aliyê wê rojnamê bi xwe ve hatiye weşandin tune ye. Ew rojname di hejmara xwe ya 29 Tebax 1942 an de dinivisîne: " Sê nexweşê xuriyê li Beyrûtê hatin dîtin."

Wê rojnamê dît ku ev "xelat" kurdên muhacir, belengaz û brîndar ji lubnaniyan re bi xwe re anîne.

Di wê demê de herkes dizanibû, ku nexweşîya xuriyê li Lubnanê, nexweşîyeke gelek normal bû û li her derê û li nav her grûbî hebû. Lê, ev nûçe-qerfa biçûk dide xwuya-kirin dijitiya li dij kurdan ji mêtj ve hebû. Ew jî wek ref-leksekî ji sistema mezhebiya Lubnanê yek e.

Di eynî demê de ji grûbîn din, ji hemû sewyian memûrên fermî û nefermi pêk hatin, wek ermeniyêñ muhacir ku bi kurdan re hati bûn Lubnanê; ketine parlementoyê. Di parlementoyê de mafê grûba xwe parastin. Di eynê demê ew hukumetên ku li Lubnanê çedîbin, ermenî ciyê xwe di nav hukumetê de digrin. (2) Di wan 60-65 salan de ji kurdan memûrên fermî û pispor nîn e. Heta roja iro mirov nikare memûrekî ku bi rutba mudûrekî di nav kurdan de bibîne. Ev tişt jî, ji bihevketina sistema lubnaniya grûbî tê. Ji ber ku hukumetên Lubnanê, kurdan wek grûbek nabîne. Ji derê kurdan, grûbîn din, li ser nufufen wan, li ser mezhebîn wan têñ nivîsandin; kurd jî, ji ber ku sünî ne, lê sünî jî kurdan ji xwe û ji grûba xwe qebûl nakin.

Hukumeta Lubnanê, di 17 ê Heziranê 1946 an de qanûnek bi numera 6628 an derxist. Ev qanûna ha li ser grûbîn multecî gelek tesîr kir Li gor vê qanûnê hikumetê komîsyonek pêk anî, ku erd û araziyêñ sultanê Osmanî, Sultan Ebdulhemît li wan grûbîn multecî belav bike. Ew jî, ji bo ciwarkirina grûbîn multecî bûn. Wê komîsyonê, erd û araziyan par kir û mafêñ wan tespit kir. Komîsyonê, heqê erd û araziyan bi texsîtan ve girêda, heta 20 salan. Hukumetê, di dawî de ew grûban ji heqê texsîtan efû kir û ji wan grûban re wek alîkariyek hesap kir. (3) Di vê parkirinê de li herema Rasileyê (Lubnan) û Encer erd û arazi da grûba ermeniyan. Lê, kurdên ji vî mafê jî bê par man û vî tiştî jî, tesîrekî kûr û giran li ser jiyana wan a rojane hişt. Kurd bê cî û bê war man! Kurd mecbûr man û ji xwe re xaniyêñ teneke çêkirin. her çend malbat di xaniyekî teneke de diman. Navbera xwe bi çarşefan dibirin.

Heriwa suryaniyêñ ku bi kurd û ermeniyan re hati bûn Lubnanê, wan jî alîkarî û piştgirtî dîtin. Di vî warî de dêra wan roleke mezin list. Suryaniyan di dêra Marcircos de civandin. Di bin serokatiya Vikont Flîp Diterzî de komîtek pêk anîn. Komîtê, ji bo hemû mafê macirêñ suryanî xebat kir. Komîtê, ji macirêñ suryanî re imkanen cil, kar, ciwar çêkir. Ji bo ciwarbûna wan li Beyrûtê, ji bo lêkirina xaniyan erdeke bi 13 hezar herin (herinek 70 cm e) kirî. Ji suryaniyan re li wê heremê bi kevir û beton xaniyan çêkir.

Tesîr a kûr û mezin a ku li ser kurdan bû û kurd di vê rewşa xwe ya reş û êş de man, pirsa hemwelatî (wetandasî) ye. Li gor grûbîn mezhebî, hemû grûban mafêñ xwe yê hemwelatiyê girtin, lê kurd ji vê mafê xwe bêpar man. Di warê hemwelatiyê de ji 25 salâvir de ye, ku hukumet û parlementoyêñ Lubnanê hîn dê li ser hemwelatiya kurdan difikirin. Hêj ji rewşa kurdan re çare nedîtine. (4) Mirov kare bibêje heta iro ji kurdên Lubnanê ji %10 hemwelatî girtine û ji % 10 ji kelpenufus in. Kelpenufus ev e, ku tiştekî wî yê fermî nîn e. Bê qeyd û nufus e. Ew kesen ha sa-

xên mirî ne. Tû mafêن wan yêن însanî nîn e.

Hemwelatî ji bo pêşveçûn û serketina însan gelek giring e. Ew kurdêن ku rewşa wan ji 25 salan heta iro hu kumet û parlamento ya Lubnanê ku li ser nefikiriye û birtyar ne da-ye, mafêن wan yêن memûryetiye tuneye. ûhw. mafêن wan yêن ku di şirket û sazgehêن fermî û şexsi bixebeitin tune-ye; eskeriya wan qebûl nakin. Nikarin ehliyet bigrin. Nikarin şirket û sazgehêن sinayî û ticarî ji xwe re çêkin. Ma-fêن wan yêن têkevin sigortayê ji nîn e. Mafêن wan yêن tatîlê, saet û demêن kar û teqavêdataliya kar û hw nîn e. Îmkanêن pisporbûnê ji nîn e. Ger bibe ji nikerin bixebeitin, ji ber ku karibe bixebeitin divê endamê sendîka mesleki bin! Ew ji hemwelatiya Lubnanê pêwîst dike. Divê ez li vê derê bînim bîra xwendevanan, heta ew kurdêن ku çend salan berî hemwelatiya Lubnanê ji girtine; dîsa xwe bîyanî dibînin ji ber ku li Lubnanê dibin tesîra dîni û grûbî de mane. Alîkariya wan a madî û manevî nabe. Ji ber vê yekê yêن ku rewşa kurdêن li Lubnanê dizanin kêmaniya ulmdar û pisporan dibînin. Wek dixtor, dezgevan (muhen-dis), avuqat û hw. Heger hebin ji, mirov kare wan li ser ti-liyêن destekî bijmêre.

Ji ber ku kurdêن Lubnanê, di demeke dûr û dirêj de bê hemwelatî mane, loma ew bê xwendin, kar, pêşveçûna civakî, zanistî, siyasi mane. Ji van sedaman ji wan re ji hemwelatî, karên sivik, meywefiroşî û wek emele maye. Pêşvemayîna wan a aborî, wan ji xebata civakî û siyasi ya rêxistinî dûr xistiye. Ü komelêن wan yêن civakî û siyasi di nav dijîti, berberî û kêmasiyan de hiştine.

Ew derd û keserên ku kurdêن li Lubnanê dîtine; li ber van deh salêن dawî tiştekî hindik e. Ew deh salêن dijîti û berberiya ku ji peymana 1943 yan derket ev zerarêن ku li grûba kurdan bûye bi hejmareke pîvandine û bi awakî nispî, mirov dibîne zirara herî mezîn gîhaye kurdan. Li çarşî û kolanêن Lubnanê bi top û bombayêن kor û bi te-qandinêن dinamêtan bê hejmar keç û xortêن kurd têن kuştin. Dema li Beyrutê şer ges dibe; kesen girêdayi-yêن grûbêن din ji taxêن şer der dikevin û xwe dispêrin grûbêن xwe. Lê kurd, ji van imkanan ji bê par in. Ew wek dîlan (êşiran) li Beyrutê di nav şer û agir de bêçare dimîn. Tû cî û war ji wan re nîn e, ku pê ve herin. Da ku kur-dek karibe ji nav şer û agir derkeve, divê çend cara dibin kontrolêن milîsan de derbas bibe. Ji ber ku kurd ji ne hem-welatiyêن Lubnanê ne û bê pasaport û nufus in, ji aliyêen milîsan ve têن girtin. Ji vê sedemê ji (5) bi sedan kurd, di girtîgeh û zîndanêن milîsan de hene. Tû kes bi mirin û mayîna wan nizane. Bi taybetî FALANC û faşîstêن Lub-nanê kurdan grûbeke bîyanî dibînin û bi ci awayî dibe bila bibe, dixwazin wan ji kok ve hilkin. Ji bo FALANC û faşîstan ferq nîn e, ku kurdêن hemwelatî be an nebe. Li ba wan kurd, kurd e. Di van deh salêن şer de hemû metodêن terorîst li dij kurdan bi kar tînin. Taxêن ku bi piranî kurd li wir dijiyan, FALANCISTAN ew bindest kirin wek " MESLEX, NEBHA TILZAHTER." Li wir li dij kurdan qetliam çêkirin. Di van deh salan de kesen ku li kurdan xwedî derketa tune bû û tuneye. Lê Lubnanî qet nebe ji bo pêş heviyeke wan heye. Lê belê yêن kurdan ew hêvî ji nîn e. Ew proja ku ji aliyê hereka niştimaniya Lubnanê ve dê pêk bihata, bi hilweşandina wê ve hemû hêvî û gumana kurdan ji winda bû. Ji ber ku ew proje, ji kurdan re hêviyek bû li dij grûbêن mezhebî yêن ku ji kurdan dilres in. Her grûbêن mezhebî herema ku dixin bin destê xwe, rews û idara wê li gor menfeata xwe ya

grûbî tertip dikin. Ew grûp hemû, kurdan bîyanî dibînin û bi her cûrêن metodan dixwazin kurdan ji herema xwe dûr xin. Ü werwiha kurd êtigî (tada) ji her alî ve tê serê wan. Ü kurd ji her alî ve bê alîgir dimînin. Ji vê rewşê re mînaka herî mezîn û berçav ev e, ku di sala 1983 yan de dema demdemî (muwaqat) şer rawesta, ji aliyê fermî û netewî ve kurd bê xwedî man. Dîsa bîyanî hatin dîtin. Di vê dema ha de bi dizî û bi eşkera êrisen kurdan dikirin. Hemû metodêن xirab li dij wan bi kar anîn, wek kuş-tin, revandin.... Ew bûyeren ku çêdibûn bi derew û bi bê bextiyan dixistin stuyê kurdan. Dewlet bi xwe ji, li sedeman digeriyen ku komele û rêxistinê kurdan hilweşîme. Wek komelya Zanistî û Civakiya Kurdêن Lubnanê û Partiya Demokratîk Kurd li Lubnan. Ji bil van metodan, hu-kumeta Lubnanê bi awakî fermî, ji bo koçkirina kurdan metodeki nû pêk anî. Ew ji dema ku kurd dixwazin herin nufusen xwe yêن hersalî nû bikin (6) hukumet ji bo nû kirina wan nufusan, ji kurdan dokumenten fermî dixwaze ku ew nufus ne sexte ye. EV BÜYER TIŞTEKÎ GELEK ECAYİB E, HUKUMET JI BO KU NE SEXTEBÛNA NUFUSE BÌ CÌ BIKE: DIVÊ DOKUMENT LI BA HUKU-METE BIN. LÈ YÊ KURDÊN LUBNANÊ TERS E, HUKUMET JI BO NE SEXTEBÛNA NUFUSA WAN DOKUMENTEN FERMÎ DIXWAZE. Bi vî rengî hes nikare dokumentan peyda bike. Kurdêن reben ji derin meqbûzen (faturê) elektrîkê, avê û dukanan dibin pêşberê memûran dikin; ew ji wan meqbûzan qebûl nakin, dibêjin " ev ne fermî ne" û memûr, ji wan meqbûzen fermî ji we-zaretekî an ji ji daireke fermî dixwazin; ji ber ku memûr baş dizanin ku ew tişt li ba kurdan tunin. Ü di dawî de nufusa kurdan ji kurdan digrin. Ü bi vî awayî koçkirina kurdan tê ber derî. Koç destpêdike; lê pirê caran ev koç dibe koça dawî. Di kuçe û kolanêن Lubnanê de cenazên wan têن avêtin!

Ji kurdêن Lubnanê re iro alîkarî û piştgiri pêwist e!

1 — Peymana 1943 an, bingehê Dewleta Lubnanê danî, wê peymanê karûbarêن dewletê di nav xwe de par kir. Li gor peymanê: a) Serokê komarê ji xiristyanê Maronî b) serokê vezaretê ji musilmanê sunî; c) serokê parlamento ji musilmanê şii; d) serokê leşkerî ji xiristyanê Maronî Ü hw karûbarên dewletê li gor vê peymanê li grûbêن mezhebî belav dibe.

2 — Serokê komarê ji aliyê parlamento ve tê hilbijartîn. Serokkomar vatinî dide serokwezîr û serokwezîr ji, li gor grûbên mezhebî wezîran hildibjere.

3 — Ev alîkarî mafê hemû grûbên multecî bûn; lê mixabin kurd jê bê par man!

4 — Di sala 1960 i de hemwelatî ji bo kurdan di parlamento ya de xistin binçavan. Ji bo hemwelatiye nedîn kurdan kaxizek ji wan re çêkirin û jê re gotin " qeyd-elders" divê ev kaxiz her sal bêt nûkirin. Ji sala 1960 an heta iro parlamento ya Lubnanê hemwelatiya kurdan berçav dike(!)

5 — Di salêن 1982-1983 ê yan de dema ku İsrâîl êrisen Lubnanê kir û Beşîr Cimeyîl bi zor bû serokkomar, rojname-vaneke Almana Demokratîk T. Alxsandır du car çû Beyrutê û ew wiha dinivise: 2700 Xortêن kurd li Beyrutê windayine. Bi sedan kurd di kampen Sebra û Şatîla de hatin kuştin. 276 xortêن kurd di girtîgehê Falancistan de hatin kuştin. Di sala 1975 an de hukumetê ceza da 83 kurdan. Bi qanûn malên kurdan hemû hatin kontrol kirin.

# şêwîrmendê dewleta tirk

KOSE

M. Ali 23 EKİM  
BIRAND 85

Rojnamevanê tirk M. Ali Birand, di roja 23.11. 1985 an de di rojnama tirk "Miliyet" çapa Ewrupayê de bi navê "herçiqas diçe pirsâ kurd li Ewrupayê fireh û belav dibe" nivisarek nivisand. Ez, wê nivisara M. Ali Birand li hember çap dikim. Him dibe belge û him jî, xwendevanê me yên ku bi tirkî dizanin bila tevayıya orjinala nivisarê bixwînin.

Ez dixwazim berî ku qala babeta nivisarê û şirovekirina wê bikim; çend gotin di derheqê niviskarê nivisarê M. Ali Birand de bêjim.

M. Ali Birand kî ye?

Bi rastî M. Ali Birand ne rojnamevan e. Wek gelek şoreşgerên kurd û tirk pê dizanin, ew peyayê CIA ye. Ü ew aqilmend û şêwîrmendê Dewleta Tirk a koloniyalist e. Li ser navê rojnamevaniyê û nûcêgîhaniyê M. Ali Birand bû çend sal in, ku li navça NATO, li bajarê Bruselê dimîne. Ew, carna li Tirkîyê û carna jî li Emerîka Yekbûyi ye. M. Ali Birand, di nav dewleten Nato û Tirkîyê de, bi taybetî di nav Emerîka Yekbûyi, Almanya Rojava û Tirkîye de têkiliyên tarî û dizi dibe û tîne. Navbendi û şêwîrmendiyê dike. Pispore Dewleta Tirk a derveyî ye. M. Ali Birand, ne bi resmî, lê bi şewekî ne bi fermî şêwîrmendê Ankarê ye....

M. Ali Birand, di vê nivisara xwe ya ha de bi kurtayî wiha dibêje:

"Ew kesen ku li Rojhilata Navîn, di nav çar dewletan de belav bûne û xwe "kurd" dinasin û dibînin; li Ewrupaya Rojava xebat dikan, tekoşîn didin.

Kurd li Swêdê, bi zimanê xwe weşan, hîndekarî û perwerdekariyê bi swêdiyan dan qebûlkirin. Niha jî, ji bo vê yekê li almanyê xebat dikan. Li Almanyê dibêjin, ku 'ji bil grûba tîrkan, spanyol û İtalyan grûba herfî mezîn em in. Daxwaza wan ev e, ku Dewleta Alman ci heq daye wan grûbîn biyanî divê bide wan jî. Di vê çarçovê de bi kurdî weşana radyo û TV, di dibistanan de perwerde û hîndekariyê û di mahkeman de tercûman dixwazin. ûhw...

Ji sosyal demokraten alman, dosteki min ê bi namûs di vê babetê de wiha digot:

'Edî qet civîn tune, ku grûbîn kurdan tê besdar nebin, nepeyvin, daxwaz û pêşniyariyêñ xwe pêşber nekin. Mirov ditirse û nikare li dij daxwazêñ wan raweste. Sosyal Demokrat, Kesk û heyâ Liberal jî, ji bo kurdan ji xwe re politikeke tespît kirine.'

Di form û platformen navnetewi de jî doza kurdan herwiha aktuel e. Di van sê salen dawî de pirsa kurdan, di sedî de sed û pencî zêde û fireh bû.

Di Konsey û Parlamentoaya Ewrupayê de, kengê li ser Tirkîyê bêt peyvandin, pirsa kurdan jî tê holê û bi Tirkîyê ve girê didin. Ji ber ku Îran, Îraq û Suriye, di form û platformen Ewrupayê de cî nagren problemeke wan yê wilo jî nîn e.'

M. Ali Birand, dibêje, ku berê grûbîn kurdan tenê bi komunostan re peyvendiyen dadan; lê niha kurdan taktik guhartine. Grûben kurdan niha bi serê xwe kar dikan û heta liberalan jî diçin û bi wan re peyvendî datînin. Kurdan çarçova xebatê fireh kirine. Ew hem ji Rojava û hem jî ji Rojhilat alyakî û destek digrin. Di nav sazgeh û platformen Ewrupayê de Tirkîye bi tenê maye. Tirkîye, di van platforman de li dij wan iddian bes bi hevoket "kurd tunin" bersiv dide.

Belê kesê ku M. Ali Birand nenase, dibe ku çaxa vê nivisarê bixwîne dê bêje "ev rojnamevanê tirk kesekî demokrat e. Hebûna kurdan qebûl dike." Na! Ne wiha ye. M. Ali Birand Sînyalan dide Dewleta Tirk, û dibêje "li gor vê rewşa nû, tedbirîn nû bigrin! Pêşî li xebata kurdan bigrin. Hinek imkan û genal û deriyêñ ku hin ji kurdan re venebûne, ji niha ve bixitminin. Em bi metodên kevin nikarin pêşî lê bigrin."

M. Ali Birand, bi zanayı bûyeran mezin dike û şandide. Belê, divê kesen aqilmend û şêwîrmend politika rovityî bas bizanibe. Bi rastî rovityî wek M. Ali Birand gelek kêm in. Ew hem rovityî Asyayê û hem jî yê Ewrupayê ye.

## KÜRT SORUNU AVRUPA'DA GİDEREK YAYGINLAŞIYOR...

**O**RTADOĞU'da dört olkeye dağılmış durumda yaşayan ve kendilerini "Kürt" olarak görenler, Batı Avrupa'da mücadele veriyorlar. Son 4-5 yıldır da, epey mesafe almaya başladıkları artık çok açık biçimde görülmüyor.

İsveç'te kendi dillerinde yayın, eğitim olanağını kabul ettirdikten sonra, şimdî de Almanya'yı sıklıkla turistlerini sürdükleri en önemli nokta da "Kendilerinin Türkler, İspanyol ve İtalyanlar'dan sonra en geniş yabancı grubu oluşturduklarını" belirterek, diğerlerine ne yapılıyorsa aynı istemeleri. İşte bu çerçevede içinde, Kürtçe TV yayını, radyo yayını, mahkemelerde Kürtçe tercûman, okularda eğitim vs....

Almanya'da sosyal demokrat uğraşı için namusu uğrazi veren bir dostumuzun geçenlerde anlatıkları, olayın nereye kadar vardığının adetle simgesiydi:

"Artık bir toplantı yok ki, Kürt grupları temsil edilmesin, konuşmasın, isteklerine bulunmasınlar. Karşı çıkmaya dahi korkuyor İnsan ve bu durum özellikle son zamanlarda giderek artıyor" diyen bu dostumuz, Alman Sosyal Demokrat Parti, Yeşiller, hatta Liberaller'in dahi bir Kürt politikası oluşturduklarını ve giderek daha açık destek vermeye hazırladıklarına işaret ediyor ve "Bizi dahi susturuyorlar" diyordu...

★ ★ ★

**A**YNI durum uluslararası kuruluşlar için de geçerli. Bu forumlarda Kürt sorunuyla ilişkin karar tasarıları, toplantılar, gösteriler son üç yıl içinde, eskiye oranla tam yüzde yüzeli arttı.

Avrupa Konseyi, Avrupa Parlamentosu gibi uluslararası forumlarda "Türkîye" daha moda bir konu olduğu için, Türkiye ile ilgili hangi karar çıkışa veya bir soru sorulması söz konusu olsa, hemen Kürt konusu da ekleniyor. İran, Irak veya Suriye bu kuruluşların gündemlerinde fazla görülen ülkeler olmadıklarından dolayı, Kürt konusuyla ilgili ortaya pek çıkarılmıyor. Sonra hemen Türkiye'ye bağlanıyor.

Hele Kürt gruplarından öneşî bir bölümünün bu kuruluşlara eskiden olduğundan aksine Komünist Parti veya kuruluşlarla birlikte girmek yerine kendi başlarına görünümleri, basın toplantıları veya gösteriler düzenlemeleri, özellikle taktik değiştirmeleri de lehlerinde sonuçlar verir oldu. Eskiden, Komünizm korusundan dolayı, Kürt sorununa pek yakınlasmak istemeyen liberaler ve muhafazakârlardan bazılan, şimdî oylarını değiştirdip lehlerinde kullanır oldular. Böylece destek tabanları giderek genişliyor. Bu durumun önumzdeki yıllarda daha fazla artacağı da şimdiden açıkça görülüyor.

★ ★ ★

**O**RTADOĞU'da Kürt sorununu destekleyenler çok net şekilde ortada. Kimse de saklamıyor. Başta Türkiye Komünist Partisi olmak üzere, tüm komünist partiler, sosyalist parti ve gruplardan önemli bir bölüm, sendikalar...

Kürtler, hem Doğu, hem de Batı'dan destek alıyor. Baştı, ülke ve kuruluşlar "Eğer bîz bir şey yapmazsak sahayı boş bırakmış oluruz. O zaman da karşı taraf Kürt akıma tam anlayıla hâkim olur" diyerek, tehlîkelerini göre göre desteklerini sürdürüyorlar. Aynı gerekçeyi Doğu veya komünist destek de söylüyor ve Batı yanılı bir Kürt hareket olmaması için, kollarını açıklarını belirtiyorlar. Resmi gerekçeler ise "İnsan hakları-ezilimîş halkın haklarının savunılması" olmasına rağmen, gerçekte her iki taraf da, ilerde Ortadoğu'daki bir olasılık karşısında şimdiden sağlam bir pozisyon tutmaya çalışıyor.

Avrupali kuruluşlar ve ülkelerde Türkiye bulunduğuundan dolayı, olay başka ülkelerde de ilgilendirmesine rağmen, tek muhatap durumuna düşüyor. İddialar sırasında Türk temsilcilerin savunma teması da bir tek cümle:

"Rizde Kürt yok."

Milliyet

# DÊ KÎ ZENGIL

## DI HUSTÊ PISİKÊ XE?

Dema merov li rewşa kurdan temaşe dike, dibîne matmyî, ji ber ku kar û barêñ wan di nav nigan de maye, kes aîf wan nake û tu dibê qey ew jî bê destin, pûç û korin. Gelo ji çi hatiye ev bê kêriya wan ? ..

Heger em vegeerin welat emê bibînnin, ku bi çuk heya mezin bi yek gotinê dibêjin : 'Riya gizgariyê di yekityê de ye, cikanina vê ermancê, "Zaroyên şîr helal" dikevin nav hêzîn kurdan ên rengo-rengo û pir, dako wan li hev bînin. Lê ew jî, li ber lehiya berberiyê dirin û dikevin gergerinokê... Heger hat û ev "zaroyên şîr helal" ji gergerinoka windabûnê derkevin, destêñ xwe jî bêneçari daşin ser hev û bi yek devî dibêjin: "Qey xwedê wiha kiriye... Qey qedera me kurda wihaye, divyabe, em wek noka, li tehtê keve..."

Helbet rewşa kurdêñ li Ewripa ne durî kesen li welatin. Ji ber ku herdu katêñ darêkêne û ji yek kokêne... lê em bixwazin nexwazin, rewşa kurdêñ ewripa ne mîna yêñ welatin.. Heger li welat girtin, lêdan û kuştine, li vira, li meydânê bajarêñ ewripeyan kurd bandikin em: kurdin. Ü ne tenê wiha, ew karin kovar, rojnâme, pirtûk û tiştêñ din hîn giringtir çabikin, bi kar bînin.. Lê mixabin ev patinsalêñ ha bicik nayê.

Belangazêñ hundirê welat, yêñ kezeb şewitû dibêjin: 'Ma hun bendî çi ne ? '

Bi rastî jî, em bendî çi ne ?

Bersîv li ser vê pîrsê çîvanokek gelirî bi bîra min anî: "Dibêjin piştî mişkîn cî nê tebata xwe ne kirin ji pişkî, li hev civyan ji bo ko rêça xilasê ji xwe re bibînnin. Pêşneyar pîrbûn.. Hinka digotin-piraniya wan xort bûn-destûra me bidin, ya xwedê wê bi diya me de, yan jî wê bi diya pişkî de. Pîr û kalan ji wan re gotin : Hûn naşinin, dert û hinerêñ dijminê xwe nasnakin.

Piştî vê axîtinê bêdengiyê ew girtin. Di ber xwe de dikirin niç-niç, mîna kesê, ku bêje "La hewlila." Mişk man wiha heyâ yekî navuser şekirek şikenand:

- Mane dibêjin, ku pişkî û kûçik mîna me dijminê hevin. Ma çîma em xwe naspêrin wî ji bo ku me bihimîne ji pişkî !

Kalepîrekê lê vegerand:

- Dostaniya kûçik ji me re nabe, tevî ku dibêjin: 'Dijminê dijminê no-doste.

Çend xorta bi hev re pirs jê kirin:

- Gelo çîma, dostanî bi kûçik re nabe ?

Kalepîr li wan vegerand:

- Berî her tiştî bendayetî tê danîn, gava muhtaciya du benda ji hev re hebe. Divê hun ji bîr nekin herçî bendê xurt ne ji bo çavêñ reş dostaniyê bi yêñ qels daşîn. Ez jî ji we dipirsim ji bo ci wê kûçik bendekê bi me re çêke ?

Hemû man bê deng. Kalepîr ji gotina xwe berdewam kir:

bavê nazê

- Helbet, ku hinera me ev hiner be, wê ti muhtaciya kûçik ji me ra tuneye. Henger niha hinêñ mîna me qels, di dijminyî bi pişkî re bikrana, vêga me karibû bendayetî bi wan re çêkira.

Yekî ji xortan bi aqilsivikî peyva kalepîr birî :

- Naxwe, ka em û pişkî bi yek bendê li ber kûçik rabin.

- Eferim bavê mino - kalepîr bi qerf lê vegerand - ji xwe ev ji me kêm ma bû! Xelasiya me ji destê pişkî tuneye, hîn tu dixwazi me bera pêxela kûçik de.

Xort bi poşmanî dev lêva xwe kir û dîsa deng ji wan biliya... Vêga mişkekî kal, perixî û hezhizî bi dijwarî rabû ser xwe, berê xwe da civatê û got:

- Ev ne civîna pêşîye, ku min xwe têde dîtiye. Di xor-tanî, navoserî û yextar bûna xwe de gelek civîn min dîtin. Ji bo serketinê gelek rê û xaçerêk henin. Lê nayê bîra min, ku rojekê ji roja me bi dil û can da ser yek ji wan riyan. Hergav dest vala em ji civînê xwe derdiketin. Wego hun dibînnin em hîn li ciyê xwe ne. - Mişkê perixî hinekî ma rawistîyî, bîhna xwe anî ber xwe û gotin berdewam kir. - Helbet, tevî wiha jî nabe em destêñ xwe dey-nin ser hev. Lewra bê tevdîr bûn bi kêrî me nayê.. Tiştê ku di vî warî de dixwazim ji we re bêjim eve: Divê hun nasbikin, ku rasta-rasta em nikarin herin pişkî.. Emê bi vî hawayî pê nikaribin.. Loma divê em li fen û fûta bigerin.. Berî hatina civînê ez pir fikirîm, min dît ku pişk tim û tim bi xafiltî me digre. Ji bo ko em bi hatina pişkî bihisin, divê em zengilekî di hustê wê xin.

Xorta mina hergav bi xwîngermî bi yek dengî bankirin:

- Raste... Xebera kalo ye ..

Bi vê axavtinê qerebalix kete nav civatê. Diyar bû, ku qerebalîk û kurtepişt wê dirêj biba, heger aqildarekî din ji mişkan ev pirs nekirba:

- Başê.. gotina kalo raste û di ciyê xwe de ye, lê wê kî zengil di hustê pişkî xe ? - Civat ma bêpêjin û aqîldar bi xwe peyv dom kir. Bêguman sera-sera em nikarin berî bidin pişkî. Divê em zengil di hustu xin, bê ku bi me bihise..

Kalekî din gotin ji devî wî girt:

- Pir rehete katê pişkî razê emê xortekî dudyâ bişînin, ku zengil bi dizî pê vekin..

Yekî ji xorta got:

- Mane dema pişkî radizê çavêñ xwe nagire..

Pirqînî bi kal û pîran ket.

- Na, kurê min, - Mişkê aqildar lê vegerand - dema pişk dikeve xew, çavêñ xwe venake. Lê kevrosk wiçâsi tirso-neke loma, dema radizê jî çavêñ xwe nagire...

... Dibêjin piştî vê civînê rojnare, ku mişk li hev nahewin... Lê her û her pişk bi zengile û mişk hîn behra wîne...

# ji bo destûra federasyonê ya nû

## PÊŞNEYARÎ

### KOMÎTA KOORDÎNE

#### 1. NAVÊ FEDERASYONE

Navê Federasyonê, 'Federasyona Komelên Kurd Li Swêd e. Navê Federasyonê bi Swêdfî, Kurdiska Riksforbundet'.

#### 2. QADA XEBATA FEDERASYONE

Qada xebata Federasyonê Swêde. Merkeza Federasyonê li Stockholmêye

#### 3. QARAKTERA FEDERASYONE

Federasyon rêxistîne demokratik e ji komelên kurd li Swêd pêktê û bi tu rêxistinê sîyasi ne girêdayîye, karê rêxistinê sîyasi na.

#### 4. ARMANCEN FEDERASYONE

1. Kurdên li Swêd temsîl dike.

2. Kurdên li Swêd derheqa civata Swêd agahdar dike û ji bo çaroserkîrina pirs û pirsgirekîn kurdên li Swêd xebat dike.

3. Ji bo pêşde birin û belavkirina ziman û çanda kurdî xebat dike.

4. Ji bo pêşdeçûna ciwanêñ kurd û halkirina pirsên wan xebat dike.

5. Ji bo halkirina pirsên jinêñ kurd xebat dike.

6. Ji bo pêşdaçûna zarokêñ kurd xebat dike û imkanan bo wan hazir dike.

7. Alikariya multeciyêñ kurd dike û wan derheqê mafêñ multeciyen agahdar dike.

8. Gelê Swêd derheqa pirsa kurd û Kurdistanê agahdar dike û piştgiriya wan digre.

9. Piştgiriya tevgera gelê Kurdistanê li her çar parçan dij zordestiyê dike.

10. Bi rêxistinê demokratik û civakîçi biyani, ci Swêdfî-hevkari dike.

#### 5. Bİ CİANINA ARMANCEN FEDE-RASYONE

1. Di gel merciyêñ resmî û rêxistinê civakî danûstandin datine.

2. Ji bo kar û barê agahdarî; belavok belav dike, sêmîner û konfîransan hazir dike, weşanêñ giştî (massmedia) bi kar tîne, kursa vedike, şevêñ çandî û piştgiri amede dike, gera hazir dike.

3. Bi komelên endamve hevkartî dike

û projan hazır dike.

4. Sekreterekî bo jinêñ kurd hildibjêre.

5. Sekreterekî bo ciwanêñ kurd hildibjêre.

6. Komîtekî bo xwendin û terbiyet kirina zarokêñ kurd hildibjêre.

7. Komîsyonekî bo multeciyêñ kurd saz dike.

8. Kovarekî perîyodîk bi zimanê kurdi diweşîne.

#### 6. ENDAMETÎ

1. Her komeleyê kurd ku di belediyekîde dixebite, xwedî destûr û bi kêmanî panzdeh (15) endamên wê hene û destûr û programa Federasyonê qebûl dike, dikare bibe endamê Federasyonê.

2. Komeleyê ku dixwaze bibe endamê Federasyonê, divê muracata xwe bi nivîsandî bike û bi muracata xwere destûr û programa komelê, lîsta komîta kargerê komelê û jîmara endamên komelê ji Federasyonê bisîne.

3. Komîta Kargerê Federasyonê piştî muracata komelekî bo endametî, derheqê muracata komelê bi derengî hundîre mehekîde biryara digre. K.K. biryara berendametî dide, an jî muracata komelê bo endametî reft dike. Mafê her komelê heye, wekî di kongra Federasyonêde itîrazî biryara K.K. bike.

4. Kongra Federasyonê biryara endametiya esîl dide. Mafê komelan itîrazkirina biryaren kongra Federasyonê tuneye.

5. Her komelê ku dibe berendam, divê wekî endamekî esîl tevî kar û barê Federasyonê bibe û heqê endametiya xwe bide.

6. Federasyon di her belediyekîde komelekî kurd wek endam qebûl dike. Belediya Stockholmê îstîsnaye. Eger di belediyekîde du komele pêwîstbe, Federasyon lêgerînekî çedike û di kongra xwede biryar digre.

7. Kesek nikare bibe endamê du komelan, ku endamê Federasyonêne.

8. Divê her komêle riayetê biryaren Federasyonê bike.

9. Her komele, bi şertê ku kar û barê wan ne li dij prensibên Federasyonêne di xwebata xwede serbestin.

10. Her komelê ku endamê Federasyonêye, bi prênsibê wekhevî dikare ji imkanen Federasyonê fêde bibîne.

11. Divê her komeleyê endam, berî kongra Federasyonê heqê endametiya xwe dabe. E ku nedayê di kongra Federasyonêne ne xwediyê mafê denge.

12. Her komelêye endam, divê mehekî berî kongra Federasyonê kongra xwe çê kiribe, û lîsta komîta kargerê komelê û nûneran, rapora xebatêni xwe ji Federasyonêre bisîne. Her ûsa bi mehekî berî kongra xwe Federasyonê ji kongra xwe agahdar bike.

13. Ger jîmara endamên komelekî dakevin binî panzdeha(15), mafê wê komêle tune wekî nûneran bisîne kongra Federasyonê. Ew komela dikare lênenrekî bisîne kongra Federasyonê.

#### 7. JÎ ENDAMETÎYÊ DERKETIN:

1. Komeleyê ku endamê Federasyonêye, tenê dikare bi biryara kongra xwe, xwe ji endametiya Federasyonê bikşîne.

2. Komeleyê ku xwe ji endametiya Federasyonê dikşîne an jî endametiya Federasyonê dikeve, an jî ji endametiya Federasyonê tê derxistin, nikare doza tu tişî (madî an manewî) ji Federasyonê bike.

#### 8. JÎ ENDAMETÎYÊ DERXISTIN:

1. Ger jîmara endamên komelekî dakevin binî dehan (10), ew komele ji endametiya tê derxistin. Divê Komîta Kargerê Federasyonê, kongra Federasyonê bi raporekî agahdar bike. Kongra Federasyonê derheqê endametiya wê komelê biryar digre.

2. Ger komelek, ku endamê Federasyonê ye, vatiniyen xwe bi ci nine, an ji, bi xebata xwe li dij prensibên Federasyonê kar bike, bi pêşneyariya K.K. ji aliyê K. Ç. ve lêgerinek çedibe.

Gava K.C. pêwîst bibîne, dikare:

a) bala komelê bikşîne

b) endametiya komelê bicemidîne.

Divê Komîta Çavdêr raporek. derheqê wê komelê hazır bike û pêşkêşî kongra Federasyonê bike. Kongra Federasyonê derheqê endametiya komelêde biryar digre.

3. Tenê mafê kongra Federasyonê heye, ku komelekî ji endametiya Federasyonê derxe.

#### 9. ORGANEN FEDERASYONÊ:

1. Kongra giştî a Federasyonê

2. Meclisa Federasyonê

3. Komita Kargêr

4. Komita Çavdêr

10. KONGRA GIŞTİ:

1. Kongra giştî, organa Federasyonê ya herî bilinde. Salê carekî di maha Sibatêde dicive. Ji bo ku kongre karibe vebe, divê 2/3 yên nûneran di kongrêde besdar bin. Ger ji 2/3 yên nûneran di kongrêde besdar nebin, kongre bi mehekî têxir dibe û di civîna piştî mehekî bi nûneren hazir vedibe.

2. Divê komelên endam sê (3) mehan berî kongrê ji kongrê bêñ agahdar kîrin.

3. Divê raporê Komîta Kargerê Federasyonê yên xabatê û malî berî kongra Federasyonê ji komelên endamre bêne şandin.

4. Mafê endamên Komîta Kargerê Federasyonê (cîgir daxîl) dengdanê di kongra Federasyonêde tune. Lê, mafê wanê bêne hilbijartin heye.

5. Nûneren kongra Federasyonê li gor jimara endamên komelan têñ hilbijartin. Mafê her komelê ji bo panzdeh (15) endaman, du nûneran, piştî panzdeh endaman, ji bo her deh (10) endaman nûnerekî (1) heye ku bişîne kongra Federasyonê. Jimara endamên komelan ên fermî, ên ku di kongra komelêde besdarin.

6. Nûneren ku ji alî kongra Federasyonêde ji bo organen Federasyonê têñ hilbijartin, divê hetta kongra din li ser vataniyêñ xwe bin. Ger komela kû ew têde endame ji Federasyonê Bîkşîne, ew kes vatiñiya xweye, eger bi xwe dernekeve.

7. Pêşniyar ji bo biryar di kongrêde, divê çardeh roj berî kongra Federasyonê tê keve destê Komîta Kargêr 8. Biryar di kongra Federasyonêde li ser esasê piranya besit tê girtin. 15 û 21 İstîsnaye.

9. Di kongra Federasyonêdedivê xalêñ jêrîn cî bigrin:

- a) Saxîkirina nûneran
- b) Hilbijartina dîwan
- c) Qabulkirina rojevê
- d) Xwendina raporê organan
- e) Munaqeşe li ser raporan
- f) Rûspikirina raporan (Ger rapora malî neye rûspikirin, divê komisyonek ji se (3) kesan ji bo lêhûrbûna raporan bê hilbijartin.)
- g) Endametî
- h) Tespitkirina heqê endametî
- i) Muneqeşe li ser destûrê
- j) Biryar girtin li ser pêşniyanar
- k) Hilbijartina serok
- l) Hilbijartina endamên Komîta Kargêr (6 esfîl, 3 cîgir)
- m) Hilbijartina Komîta Çavdêr
- n) Hilbijartina meclisa Federasyonê (13 kes)
- o) Dawî

## 11. MECLISA FEDERASYONÊ

1. Meclisa Federasyonê di navbera kongrên Federasyonêde organa herî bilinde.

2. Meclisa Federasyonê salê çar cara dicive. Di civîna xwe ya yekemde sektereke hilbijere û tarixa civînên hêtê tê spît dike.

3. Meclisa Federasyonê di pirs û pirs-

girê kên Federasyonêde xwedî biryare.

4. K.K. û K.C. di civînên Meclisa Federasyonêde besdar dibe, derbarê karê Federasyonê Informasyon dide. Mafê K.K. û K.C. dengdanê di civînên Meclisa Federasyonêde tune.

5. Meclisa Federasyonê dikare biryar bistîne, bide pêşıya K.K. ji bo bi cianînê.

6. Ger pêvîst be, K.K. dikare Meclisa Federasyonê gazi civînên İstîsnâ bike.

7. Sekreterê Meclisa Federasyonê divê gazi civîna bike, protokolên civîna bigre û arşîv bike. Her ûsa divê civînên Meclisa Federasyonê idare bike.

## 12. KOMİTA KARGER

1. Komîta Kargêr di navbera kongrên Federasyonêde berpirsiyare bi cianîna biryareñ kongrê û Meclisa Federasyonê berpirsiyare kar û barê Federasyonêye.

2. Komîta Kargêr di civîne xweyê yekemde ji nav xwe sekreter, sekreterê malî, berpirsiyare kovara Federasyonê, sekreterê pirsên jina û sekreterê pirsan ciwanan hildibjere.

3. Komîta Kargêr bi kêmânji du (2) hefta carekê dicive. Serokê Federasyonê K.K. gazi civînan dike. Ger du (2) endamên K.K. pêvîst bibîn, dikarin K.K. gazi civînên İstîsnâ bikin.

4. K.K. biryareñ xwe li ser esasê piraniya besit digre. Ger di hin rewşande deng bi qasî hev bin, alî dengê serok qezencê dike.

5. K.K. di bin kontrola xwe û dikare komîten xebatê saz bike. (welî komî-Endamê K.K. ku nikaribe, teví 6 civînan be, ji endametiya K.K. derdi-keve û ciyê wî cîgirê yekem digre.

7. Endamê K.K. ku bê mazeret teví 3 civînan nebe, an ji li dij prensibên Federasyonê kar bike, di derheqê wî endamî de K.C. biryareñ jêrîn digre: ta xwendin û cihê wî cîgirê yekem digre

- a) balkışandin
- b) cemidandin

Cihê endamê cemidandî cîgirê yekem digre. Cezayê cemidandinê heta kongra salewextî mutebere. Mafê her endamê heye ku di kongra salewextî de xwe biparêze.

## 13. KOMİTA ÇAVDÊR

1. Ji alî kongra Federasyonê tê hilbijartin. Ji sê (3) esil û cîgirekî (1) pêktê. Di civîna xweyê yekemde, sekreterê xwe hilbijere. Sekreter K.C. gazi civînan dike, di civinande protokol digre û arşîv dike û danûstandinê bi organen Federasyonêre dike.

2. Kar û barê K.K. û hesabê malî kontrol dike û raporan ji bo kongra Federasyonê hazir dike.

3. Pirsên ku ji alî K.K. têñ, lêhûr dibe û karê pêvîst pêktine.

4. Ger pêvîst be di kongre an civînên komelande dibe.

## 14. KONGRA AWERTE

1. Ger K.K. an ji Meclisa Federasyonê biryar bigre, dicive.

2. Divê komelên endam mehekî berî

kongrê bêñ agadar kirin. Komelên endam dikarin nûneren xwe di civîna endamende hilbijerîn an ji nûneren xwe yên kevnare bişînin kongra Federasyonê a awerte.

3. Kongra awere tenê li ser pirsên ku bûne sebebê gazîkirina kongra awerte disekine.

4. Kongra awerte li ser esasen kongra giştî karê xwe dimeşîne.

## 15. DESTÜRA FEDERASYONÊ

Destûra Federasyonê tenê di kongrên Federasyonêde têñ guhartin. Ji bo guhartina destûrê ji 2/3 yan dengen nûneren hazirin pêvîste.

## 16. ABORİYA FEDERASYONÊ

1. Perên Federasyonê di hesabekî bangêde têñ parastin. Serok û sekreterê malî bi hevre ji bangê berpirsyarin. Serok û sekreterê malî heta hezar (1000) kronê mesref dikarin bê biryara K.K. bikin. Ji bo mesrefen bêtirê hezar (1000) kronê, biryara K.K. pêvîsta.

2. Hatinen Federasyonê evin:

- a) Heqê endametiye
- b) Hatîn ji kar û barê Federasyonê
- c) Alîkariya xebat ji ciyêñ rësmî
- d) Baxîş

## 17. VATINIYÊN SEROKÊ FEDE-RASYONÊ

Serok, Federasyonê li derive û di nav organen Federasyonêde temsîl dike. Di xebat û civînên K.K. de serokatî dike. K.K. bang civînan dike. Hemû xebatên Federasyonê kontrol dike. Serek ji biryareñ K.K. re riayet dike. Divê di navbera K.K. û serok de danûstandinek bi aheng û pîralî hebe.

## 18. VATINIYÊN SEKRETERÊ

### FEDERASYONÊ

Wextê serokê Federasyonê ne hazirbe, sekreter cihê serok digre. Hemû nîvîsandinên Federasyonê dînîvise protokolên K.K. digre û berpirsyarê arşîva Federasyonêye.

## 19. VATINIYÊN SEKRETERÊ MALÎ A FEDERASYONÊ


Berpirsiyare hesab û tiştîn Federasyonêye. Defterê malî digre. Defterê tiştîn Federasyonê yên invîntar digre. Heqê endametiye kom dike. Rapora malî ji bo kongra Federasyonê hazir dike.

## 20. VATINIYÊN BERPISYARÊ KOVARA FEDERASYONÊ

Redaksiyonekî ji bo kovara Federasyonê hilbijere. Divê redaksiyon ji alî K.K. de bê tesdîq kirin. Kovara Federasyonê temsîl dike. Civînên redaksiyonê idare dike û protokolên civîna digre. Hesabê malî a kovarê digre. Karê nîvîsandina bi dervere dimeşîne. Berpirsiyare arşîva kovara Federasyonêye.

## 21. FESİHKIRINA FEDERASYONÊ

Biryara fesihkirina Federasyonê tenê di kongra giştîde tê standin. Ji bobiryara fesihkirinê ji 4/5 ên dengen nûneran pêvîste. Piştî fesihkirina Federasyonê, hemû hebûnên Federasyonê ji rîexistinekî hevarmancre bi biryara kongrê dimîne.



Federasyona me, bi navê "Şeva Berbangê" şevek pêk anî. Bi rastî mirov kari bû, ji vê şevê re bi gota "Şeva Berbangê" û "Şeva Zarakan." KARDO METİNÎ şevê weha vekir:

• Xuşk û birayên hêja, zarokên xoştivî!

Bi navê redaksîyona Berbangê, em bi germî bi xêrhatina hewe dikin bo şeva me ya ku em ji zarakan re berhev dikin.

Lê welatên dagirkirî, li nav gelên bindest, di şoreşen de, zarok ji pêşmerge ne. Li Kurdistanê ku axa wê hatiye dagirkirin, gelê wê bindest e. Xelqê wê li ber xwe dide û şoreşger e. Zarokên kurd ji pêşmerge ne. Bi sedan di zîndanên faşistan de ji dayîk bûne; bi hezaran di zîndanan de ne yan ji bi agir û bombêñ dijminan dişewitin.

Zarokên kurd, barekê giran dikêşin ji destê dagirkirêñ Kurdistanê, ji birs û nexweşî û belengaziyê dinal in. Bê behrin ji xwendîn û nivêsinê bi zimanê xwe û li gelek cihêñ Kurdistanê ji xwendîn bê behrin heta bi zimanê dagirkirer ji. Ev layekî û ji layekî din her wextekê em li dirok û rewşa Kurdistanê binêrin dê bo me xuya bit ka dijminê me çiqas hov û dirinde ye hember zarokên kurd. Ne ji mêje bo balafirêñ rijêma faşista Saddamê ordugahê Zêwe bombebaran kirî û 79 zarokên kurd di temenê kulilkan de şehît ketin; ne ji mêje bû rijêma Xumeyniyê paşverû di hêrişen birîne ser Kurdistanê de bi sedan zarok kuştin yan bê xwedî hiştin. Ne ji mêje bû Ataturkê xwinrêj bi seda gungê Kurdistanê wêrankirin bi jin û zarok ve û niha ji Evrenê faşist hê wê siyasetê didomîne. Ne ji mêje bû rijêma şovenîsta Suryayê 300 zarokên kurd di sinema amûdê de şewitandin.

Lê bi hezaran sal e, dijminen me xwediyyêñ wê sistemê bûne û gelê me her maye û her li ber xwe dide û geleke amade bit xwîna xwe birijînit di rîya doza xwe de. Dê dijmin çâ wa pê karibin, gelê me maye û her dê minit û zarokên me ji mîna kuîlken Kurdistanê serê xwe helididin di ser hemî stem û zoriya dijmin dikin. Zarokên kurd bingê û paşeroja tevgîra gelê me ne. Zarokên kurd xemla welatê me ne!


Li destpêka şevê, em deqîçeyekê li ser gîynê pak û nazdarê zarokên şehît û tev şehîdên kurd û Kurdistanê radiwestin! •

Kardo Metîni îcar ji bo pêşkêşkirina gotara şevê, redakorê Berbangê vexwend kursiyê.

Bernama şevê ji du beşan pêk dehatin. Beşa Zarona û beşa çandî û folklorî. Beşa zarokan di nav xwe de bi van xalan dihatin beşkirin:

- a) Helbest;
- b) Çirok;
- c) Wêne;

# BFRBANG



Di temenê 7-9 an d


- c) Du komikên zarokan û çend pirs;
- d) Zarokên şehîdan.

Wek xwendevanêñ me pê dizanin Komîta Şeva Berbangê ji mîj ve di nav zarokên kurd de musabeqek ve kiri bû. Heta şevê ji komîte re 32 wêne (resim), 6 helbest û 8 çirok hatin şandin. Ji wan helbest û çirokan sisê sisê hatin hilbijartin. Lê wêne li gor temenê zarokan bûn du bes. Beşa yekem di nav temenê 7-9 an de û beşa du yemîn ji, ji temenê 10- an heta 15 an bû. U herweha di warê wêne de 6 zarokan diyari girtin.

Di musabeqa helbestan de Kamuran, bi helbesta xwe ya



# SEVA ZAROKAN



wêna duyemin

bi navê "Çiyayê Kurdistanê" yekemîn, Berîn bi helbes-ta xwe ya bi navê "Kurdistana Min" duyemin û Gulse-ven jî, bi helbesta xwe ya "Welatê Min û Gelê Min" sê-yemîn hat.

Di warê çirokan de Jîn bi çiroka xwe ya bi navê "Di-bistan" yekemîn, Welat bi çiroka xwe ya bi navê "Cendir-me" duyemin û Slava jî, bi çiroka xwe ya bi navê "Hati-na Min A Swêdê" sêyemîn hat.

Di beşa wênan di temena 7-9 an de Şoreş bi wêna xwe ya bi navê "Li Kurdistanê Rojeke Şîlî" yekemîn, Niştî-

man bi wêna xwe ya bi navê "Buka Kurdan" duyemin û Zelal bi wêna xwe ya bi navê "Çiroka Kuşî û Kewroşkê" hat. Di Nav zarokênen temena 10 - 15 an de Özgür bi wêna xwe ya "Pêşmerge" yekemîn, Slava bi wêna xwe ya bi navê "Sinor" duyemin û Perîxan jî, bi wêna xwe ya bi navê "Gund" sêyemîn hat.

Ji bo diyariyên helbestan, Dîwanênen Seydayê Cigerxwîn hatin dayîn. Ji bo diyariyên Çirokan jî berhevokêñ kovara Jîn û kovara Hêviyê û Tarîha Edebîyata Kurdi (Qanatê Kurdo) hatin pêşkêş kirin. Ji bo diyariyên wênan jî metaryalêñ nivîsê û wênan râberen zarokênen serfiraz û serketî hat kirin. Ü her zarok guleke sor girt!

Di pey dayina diyariyan de zarokênen biçûk di nav xwe de du komik pêk anîn. Her komikek ji 6 kesan pêk dihat. Komikek navê xwe danî Serxwebûn ya din jî, navê xwe danî Kurdistan. Ji her komikekî 5 pirs hat kirin. Ew pirs ev bûn:

- 1 — Navê çiyayê Kurdistanê yê herî bilind ci ye?
- 2 — Çemê Kurdistanê yê herî dirêj û mezin kîjan e?
- 3 — Ji her beşeke Kurdistanê navê bajarekî bêjin?
- 4 — Di sala 1925 an de li Kurdistan Bakûr, serhildanek çêbû, navê serokê wê ci bû?
- 5 — Di sala 1946 an de li Kurdistan Rohilat Komarek pêk hat, navê wê ci bû?
- 6 — Kî bingehê alfaba kurdiya latîni avêtiye?
- 7 — Kî Mem û Zîn nivîsandî ye?
- 8 — Ji Aramê Tîqrân û M. Arifê Cizrawî stran hatin guh-darî kirin û ji wan, navê stranbêjan hat pirs kirin.
- 9 — Her komikek bi xwe stranek got.

Encam weha bû:

Komika Serxwebûn 10 puan û komika Kurdistan ji 5 puan girtin. Ji her endamê komika Serxwebûn re seli-keke Temo hat dayîn û endamê komika Kurdistan ji her yekî pirtûka Pippi hat dayîn.

Programa zarokan bi dayîna diyariyên 3 zarokênen şehî-dan dawî hat. Ji her sê zarokênen şehîdan re jî, pirtûken zarokan yêndî kurdî hatin peşkêş kirin!

Li salona şevê hemû wêneyênu ku zarokan çêkiri bû û bi wan besdarê musabeqê bibûn; li ser panoyan hati bûn dalqandin. Bi wêneyênu zarokan raxistineke biçûk pêk hati bû.

Di beşa çand û folklorî de Brîndar û Delan bi hev re derketin sahnê. Delalê çend stranêñ gelêri û folklorî peşkêş kir û Brîndar jî pê re li tembûrê xist

Tembûrvan û dengbêjê kurd yê bi nav û deng Temo, bi tembûr û stranêñ xwe şevê geş kir!

Ji aliye rêexistinî û ser û ber ve, gelek këmasî û valayı-yêñ şevê çêbûn. Ü bi taybetî këmasî û valayıyêñ beşa duyemin hîn jî bêtir çêbû. Bi derengmayî û negehiştina Cwan Haco këmasiyêñ bernama şevê ya beşa duyemin hîn jî bêtir bû!..

# gotara şevê

a. tîgrîs



Di temêne 10-15 de wêna yekemîn

Ozgür

Gelî mîvan û hevalên hêja!

Hun hemû bi xêr û xweşî hatin "Şeva Berbangê." Gelo çima me navê şevê danî "Şeva Berbangê" û girin-giya şeva xwe, me da beşa zarokan?

Bersiva vê pirsa ha, mirov dibe lêgerîn û lê kolîna dîroka rojnamegeriya kurdî. Divê mirov bizivire sala 1898 an, ku bingehê rojnamegeriya kurdî destpêdike. Wek em pê dizanîn, 88 sal berê Mîthad Bedirxan li derê welat, li bajarê Qâhirê dest bi derxistin û belavkirina rojnama kurd a yeke-mîn Kurdistanê kiribû. Ü herweha bi derketina rojnama Kurdistan re, rojnamegeriya kurd, di nav rojnamegeriya cîhanê de ciyê xwe yê hêja û giranbiha girt. Ji ber sedemîn siyasi, civakî, aborî û yêñ din rojnama Kurdistan berê cî guhart paşê çapkirin û belavkirina wê hat rawestandin. Lê carek tovê rojnamegeriya kurd hati bû avêtin; zîl di-da. Lêpêştgirtin ne munkun bû. İca ronakbirêñ kurd li bajarê İstanbul'da sala 1912 an de Rojî Kurd derxistin. Di sala 1918 an de Jînê dest bi weşana xwe kir. Di sala 1920-22 an de li bajarê Silêmaniyê bi navê Pêşkewtin rojnameke din dest bi weşana xwe kir. Di sala 1925-26 Diyari Kurdistan, 1932 li Bexda Gelavêjû di eynî salê de li Şamî Mîr Celadet Bedirxan û hevalên xwe dest bi çapkirin û belavkirina Hawarê dîkin. Ü di 1942-45 yan de ji Ronahiyê derdixin. Celadet Bedirxan bi destpêka Hawarê re di rojnamegeriya kurdî de şoresh çêdike.

Di sala 1945 an de li Kurdistanâ Rohilat bi avakirina Komara Mahabat re rojnama Nişîman û gelek kovarêñ din dest bi weşanan dîkin. Komara Mahabat dibe navça çand û wêja kurd. Piştî ketina Komara Mahabatê her çîqas qels, kêm û teng be ji, navça rojnamegeriya kurd daket Kurdistanâ Başûr. Di vi dema nêzîk de li Kurdistanâ Bakûr qels-bûn û bêdengiyeke siyasi çêbû. Ew rewşa ha tesûr li rojnamegeriya kurdî ji kir. Di navbera salêñ 1962-63 yan de Dîcle-Firat û kovara Deng derketin. Lê mêtîngîkarêñ tîrk wê dengê zarok û jar fetisandin. Piştî 1975 yî disa gûlvedanek destpêkir. Lê dûr û dirêj ne ajot.

Mirov nikare rewşa rojnamegeriya kurdî, ji rewşa siyasi û civakî cûda bike. Herdu bi hev re girêdayîne. Loma jiyana rojname û kovarêñ kurdî gelek kin û kurt in. Her çar dewletêñ kolonîyalîst yêñ ku welatê me di nav xwe de par kirine tû fersend nadînrojnamegeriya kurd, ku pêşkeve. Belê li her çar perçen welat rewş wilô ye. Lê, li derê we-lat û bi taybetî li welatêñ Ewrûpa!....

Ji dema rojnama Kurdistan heta îro, kêm-zêde civateke kurdan li derê welat heye. Ev kurdêñ ku li bîyanîstanê dijîn, bi taybetî li welatêñ Ewrupa dijîn piçek be ji, ji zîlm û zordariya hêzên kolonîyalîst dûr in. Imkanêñ wan yêñ xebatê û avakirin û jiyan domandina rojnamegeriyê hene. Nemaze piştî 1965 an, kurd jisedemîn cûda cûda ber bi Ewrupayê hatin. Ü li welatêñ Ewrupaya Rojava belav bûn. Mirov kare bêje, piştî 1975 û 80 yî koçkirineke siyasi destpêkir. Îro nêzî nîv mîlyonî kurd li Ewrupa (Xweza Amerîka û Awîstralya ji di nav de) dijîn. Hezar mixabin heta niha me, ne sazgehek an ji rojnamegeriyeyeke xurt û hevgirtî pêk ne anî! Xweza Berbang ji di nav de!...

Hevalên berêz!

Berbangê di Hezîrana 1982 yan de dest bi weşana xwe kir. Di navê de çar sal derbas bûn. Heta niha bi kêmeşî, çewtî û jariyêñ xwe ve zor-bela 31 hejmar derket. Bi rastî ev ji bo me ne serketin û serfîrazi ye. Kêmeşî û qelsî ye. Ji lew re ji bo civaka kurd a li Swêdê gelek gaveke sist û paşketî ye. Îro li vê derê rewş û mercen me ji gelek divayî û gengaziyan re dest dide. Li pişt Berbangê gelek hêzên demokrat, komele û kesen welatparêz hene. Disa îro li Swêdê gelek kesen pêşketî û bijarte hene. Divê federasyon û kovara wê Berbang, derî û rûpelên xwe ji wan re vezin. Heta ji yêñ derê Swêdê re ji vekiribe. Alîkarî û pişgiriya wan bistîne. Ew kes û hêz ji, ne wek bîyanî û mîvanan li fererasyonê û kovara wê nenêrin. Ew bi xwe xwedîyê wan in. Divê û pêwîst e, têkîlî geş û xurt bibin. Em, endamîn komîta federasyon û redaksîyonê di vi warî de piçek be ji, me gav avêt. Ev şev ji, ji wan gavan yek e. Me şeva berbangê kir şeva zarokan. Ji lew re zarok hêvi û gumanêñ me ne. Mezin û pêşengen me yêñ rojîn pêşin in. Divê redaksîyonâ ku ji vir şûn de bêt, vi tore û jêbermîyî bide domandin. Her sal şevêñ zarokan çêke. Hîn fi-reh û dwelemend bike. Şevêñ ji bo nivîskar, hunermend û helbestvanêñ kurd pêk bîne. Berbang li ser ziman, çand û wêja kurdî di qada Swêd û Ewrupayê de semîner, panel û civînan pêk bîne. Di warê rojnamegeriya Kurdî de watînî û berpirsiyariya ku dikeve ser milê wê divê bi cih bîne. Bibe sazgeheke kurdî. Ji ber vê yekê ji, me şeva Berbangê pêk anî û giranî û giringiye şevê da ser zarokan. Hun dê niha bibînin, ew zarok nîn in; zêr in, şer in, mîr in! Ew nûner, berpirsiyar û barkêşen rojnamegeriya kurdî ya dahatû ne.

SPAS!

## ÇIYAYÊ KURDISTANE


Ararat û Sipan  
Serê wan digînîşê  
Hîv û strîkan  
Berf heye çar demsalan  
Zozanê'n koçeran

Daristana Zagrosê  
Dengê şêr û pilingan  
Bilûra şivan  
Evîna me Kurdan

Çiyayê Kurdistanê  
Hemî kehnî û daristan  
Tijî xezal û kovî  
Çiyayê me Kurdan

Kamuran, sal 13

Helbesta yekemîn — Kamuran




Di temenê 10-15 an de wêna duyemîn

## KURDISTANA MIN

Kurdistana min, Kurdistana min  
Dora te hemû daristan çiya û deşt e.  
Lê tu bindestê Tirk û Arab  
Û Faris î  
Gelê te îro neçar e.  
Dijminê zâlim agir li ser te dibarîne  
Ax Kurdistana min, az Kurdistana min.  
Dê tu jî rojek azad bîbî wekî welatê din.  
Roja ku gelê te şiyar bibe û zora dijmin bibe.

Berîn, sal 11

Helbesta duyemîn — Berîn



Di temenê 10-15 an de wêna sêyemîn

## WELATÊ MIN Û GELEÊ MIN

Welatek  
Bi zordestiyê hatiye parçekirin  
Welatek  
Gelê wî bi hezar sala, bi zor û tade  
Hatiye pelçigandin.  
Axa wî bi xwîna wan hatiye avdan.  
Welatek  
Destê xiraban  
Destê neyaran daye.  
Welatek hatiye ji bîrkirin, hatiye talan kirin.  
Welatek  
Di bin nîrê zordestiyê, kapîtalîst û faşîst daye  
Ew welat Kurdistan e.

Gelek  
Ku xwestine bidin ji bîrkirin, asîmîlekirin.  
Zarokên wî, jîn û mîrên wî hemû dane bin  
Zilmê û tadê.  
Gelek  
Aştîxwaz, lê ji bo welatê xwe jî şerkar.  
Gelek  
Dengê xwe bi hemû cihanê daye bîstin.  
Jî bo azadiyê û serketinê tim şer kiriye.  
Gelek  
Dibê je azadî, serfûrazî û aştî, jî bo we  
Bi sedan, hezaran, milyonan şehît daye.  
Ew gel gelê Kurd e!  
Qet quwetek tune ku bi zorê û bi zilmê wî gelî,  
Wenda bike, bike bin nîrê xwe.  
Wî gelî tim serê xwe li dijî zordestiyê, zilmê û  
Tadê rakiriye radike û ew dê bike.  
Serxwebûn ne dûr e.  
Ew gelê aştîxwaz dê azad bibe û ava azadiyê vexwe.  
**BIJÎ KURDISTAN!**  
**BIJÎ AZADÎ!**

Gulsever sal 14

BAL: Di helbesta "Kurdistana min" û di ya "Welatê Min û Gelê Min" de ji der ve alikarî hatiye bû kirin. Bi taybetî di helbesta "Welatê Min û Gelê Min" de. Jûri di dema pîvanê de vê yekê da ber çavan.

## Çiroka yekemîn — Jin

## DIBISTAN

Çaxa ez hatim Swêdê, meheke paşê min dest bi dibistanê kir. Ez di dibistanê de gelek titirsam û min şerm dikir.

Gava mamosta min, bi min re dipeyîviyan, min tiştekî jê fam nedikir. Min serê xwe tim dikir ber xwe.

Ez û hevalên xwe bi hev re bi destan dipeyîviyan. Wextê em diçün xwarinxanê, hemî xwarin dixwarin, min bes nan û şîr dixwar. Şîrê wan ji ne xwes bû.

Di dema pausê (nabendayinê) de hevalên min tune bû. Hemû dilistin, ez tenê di quncikê de dimam!

Jin sal 10 sinif 4



Di temenê 7-9 an de wêna yekemîn

Şores

## CENDIRME

Rojeke cendirme hatin girtin ser gund. Li gund du zarok hebûn. Yek çar salî bû û yek ji, pênc salî bû.

Dema ereba cendirma ji dûr ve xuya bû û hat, her du zarok ditirsin û direvin. Xwe davêjin tifikê. Ariyê davêjin ser xwe. Ji tenî û ariyê spîka çavêwan tenê xuya dike. Ji tirsâ cendirma ne wêrin bîhna xwe berdin. Ji tirsâ dile wan bêtir davêje

Gava cendirman dev ji gund berdan ew derketin cûn; zarok ji, ji tifikê derketin; hatin hundir. Ser û çavêwan û cilên wan giş arî bûn. Me gote wan; ew ci ye? Wan gotin:

— Me, xwe ji tirsâ cendirman di tifikê de vesarti bûn. Wa ye cûn, em nedîtin. Kef këfa me ye!

Welat, sal 11 û sinif 5


## Çiroka duyemîn — Welat

## HATINA MIN A SWÊDÊ

## Çiroka sêyemîn — Slava

Wextê ez hatin Swêdê cara pêşî bû ku ez li balafirê sûwar bûm. Ez dewixîm. Dû re me di balafirê de xwarin xwar. Xwarina wan xwes bû. Wêtê ku min li erdê nihêri, min got qey berf bariye. Lê bes ewr li bin min bû. Balafir di ser ewrê de difiriya. Saet heft em li Berlin daketin. Em li wir şeveke razan. Sibehê em rabûn, ku em tê kevin balafirê. Em ji Berlin firiyan Swêdê. Di 12 ê nîvro de em li Swêdê bûn. Wextê em daketin erdê balafir lerizi. Em cûn balafirgehê min bavê xwe dit. Min pêşî bavê xwe nasnekir. Bavê min, me bir mala kalikê min. Min Swêdê xweş dit. Xanî bilind bûn. Dar û şinahî pir hebû.

Slava, sal 11 û sinif 5



Di temenê 7-9 an de wêna sêyemîn

## DÜMAHIKA PANELÊ

çirokeke dirêj e. Tê de wext heye, bûyer hene û bitevayî dinav çirok û roman de fergiyatên mezin tune ne. Şakîlî got ku 5 rûpel jî roman heye. Lê min heta iro 5 rûpen roman nedîtiye... Bi ya min bi kurdî roman hene. Lê musfede ne. Ji bo edebiyata kurdî gavên pêş in. Li Kurdistanê, bi taybetî li Kurdistanâ Tirkîyê zimanê kurdî qede-xe ye. Ji ber vê yekê ziman qelse û roman jî qels e. Roman-nêñ kurdî ji 250 rûpelî biçûktir in. Naverok gelek qels in. Bi zaravê soranî romana Ahmed İbrahim bi navê Jiya Gel gelek baş e. Romana Ereb Şemo ya Sivanê Kurd jî, romanekî baş e. Brîndar du roman nivisandiye. Yek jê navê wê Soro ye. Romana SORO wek filimên tîrkan e. Soro dipe-yive û şoresh dike. Pir qels e. Keilîmîn nû hene. Roman tije şematzmû slogan in. Nivîskarîmla nizane. Bi tîpêñ bicûk dest bi cumlan dike. Lêker cûda hatine nivisandin. Di romanê de fotograf hene. Soro 12-13 salî ye, lê politik e. Keçik di qehwan de rûdine

Hêlinâ Mahmut Baksî, ji aliye ziman ve pir xirab nîn e. Hêlin keça mamostekî ye, lê dîmehê de carek xwe dişo. Gelo zarokêñ mamostan li Kurdistanâ Tirkîyê nikarin xwe bişon? Baksî jiyana hepsê nasnake. Di qereqolê de qerdyan lêdixin. Bi tirkî fikiriye û nivisandiye. Wek, "mamoste dilê min distend." Ji aliye zanistî ve gelek çewtî hene. Dibêje ku "Kurdistan di 1923 ê yan de azad bû. Ev tişt di romana M. Uzun de jî hene.

Di romana M. Uzun de gelek şâsi hene. Divê muşahade hebe. M. Uzun di romana xwe de dibêje ku "her çar aliyeñ Diyarbekirê bax û bexçe ne. (Tu rû 104). Dicle di rojhilate Diyarbekir de zelal û paçqî diherike û diçe. Lê, ne wisa ye. Ava hemû tiwaleten Diyarbekirê diçe ser Dîclê. Ez bi xwe ji Diyarbekirê me, lê min bax û bexçen Diyarbekirê jî nedît. Di rûpela 14 an de dibêje Hermus xwedâye xirabiye ye, bi rastî yê başiyê ye. Ji tirkî gelek hevokan girtiye. Wek "ji xwe derbas bûye, cavêk avêt" ûhwed... Di roman "TU" de şâsiyên imlayê gelek in.

R. Barnas : Her tişt li gor şerîetî ye. Dagerkeran îmkan ne dane ku kurdî bê nivisandin. Ji ber vê yekê kurmancî jar û qels e. Nivîskarîn ku ji Tirkîyê hatine Ewrupayê, her kes li gor taxa xwe dinivîsine. Ji bo nivîskar azadî lazim e. Mîrasa milî û cihanî lazim e. Nivîskarîn me li Ewrupa, nivîskariye di dereca sê û çaran de dîtine. Îptîdayî ne. Ji ber vê yekê ew hevalen ku nivîsandine, divê em ji wan re spas bikin. Em çibkin nikarin wek yêñ fransiz û yêñ İngîlîz binivîsin.

B. Nazê : Qesta te ew e, ku hebûn ji tunebûnê çêtir e?

R. Barnas : Belê! Bi kurdî nameke ji nivîsanin gelek baş e.

B. Nazê : Em Karin bêjin elhemdullillah romana kurdî ye?

R. Barnas : Na na! Ne wiha ye!..

B. Nazê : Dema Hawaresh em qebûl dîkin. Lê niha nivîskarîn me danûstandinêñ wan bi her kesî re heye. Di romana M. Baksî de hinek tişt hene. Em dê çawa romana M. Baksî bi cihanî bidin nasandin? Ji bo ku mirov roman binivîse, divê mirov gelek romanen bixwine. Her ev hinek pîvan tunebin, dê di nav çend mehan de gelek roman li ser me bibarin. Di romana Baksî de qet hunandina bûyeran tune.

R. Zilan : Bersiva hebûn û tunebûna romana kurdî, mirov kare bêje heye û mirov kare bêje tune ye jî. Li gor min ew kurdêñ ku ji Kurdistanâ Tirkîyê ne, nameke ji bi kurdî binivîse, şoresh e.

M. Uzun : Bi ya min wekî bes di edebiyata kurdî de roman tune, lê yeke yek roman hene. Divê berî nivîskar hebin, xwendevan hebin. Ü rexnegir hebin. Li Sovyet û li İraqê gelek kesan roman divisandî ye. Lê derî wan yêñ nû hene. Divê her kes guhêñ xwe bide wan, wan nekujin. Em ji wan re alikarî bikin. Lê ev kesê nû ne navdar in. Ji aliye din ve xwendevan gelek kêm in. Çima romanekurd nîn e? mesela ziman e. Alfabe pir in, devok pir in. Divê ziman nerm be, bi gramâtîk be. Zimanê me zimanê eşîriyê ye. Zimanê modern nîn e. Hefta berê ez li ba nivîskareki swêdî bûm. 180 Ferheng di destê wî de hebûn. Lê, li ba me kurdan heta niha qet ferhengeke kurdî nîn e. Ji ber ku li Kurdistanâ zordarî heye, romana kurdî jî dibe slogan.

Li Kurdistanâ Tirkîyê qet mueseseke kurdî nîn e, hemû yêñ tîrkan in Ji ber vê yekê mîjûyê me bi tirkî difikire. Kaniyêñ me yêñ mîli tune ne. Em li ser teoriya romanê... B. Nazê : Heval F. Şakîlî nepeyi?

F. Şakîlî : Kurdistan li welatêñ rojhilat e. Roman heye. Bi kurmanciya jîrin gelek tişt hatine nivîsandin. Fuat Temo di sala 19313 an de çirok nivîsandiye. Heta iro gelek hatine nivîsandin. Niha bi hezar rûpelan roman heye. Ew romanen ku li Swêdê hatine nivîsanin gelek qels in. Romanen Brîndar û hêlinâ M. Bak sî bi rastî ne roman in reportaj in. Mirov kare ya Mehmed Uzun re bêje roman e; lê kêmasyîn wê gelek in.

B. Nazê : Hinek kesen kurd folklorâ kurdî digrin û bi zimanê kolonîyalîstan dinivîsin. Wek li Tirkîyê Yaşar Kemal û li perçen din jî gelek in. Gelo hun di derheqê van kesan de ci difikirin?

R. Barnas : Di çerçeva edebî de, di her mîletî de kesen weha çêbûne. Mewlana bi xwe tirk e, lê xizmeta edebiyata farisi kiriye.

B. Nazê : Yanî tu dibêji, bi kîjan zimanî binivîse, dibe ji wê mîleti? Lê Cezayirîyan bi fransizî dinivîsiya?

R. Barnas : Belê, li Tirkîyê edebiyata kurdî hatiye sekandin, lê li perçeyen din dom dike. Kurd ne Cecayirîne. Rewş ne wiha ye.

M. Uzun : Ez bi xwe wisa nafikirim. Ew kesen ku bi zimanê din jî dinivîsin, mirov kare wan nivîskarê kurd bihesibîne. Ziman gelek giring e. Mesela mayin û mirinê ye. Lê ziman bi serê xwe di edebiyatê de ne tiştîkî ye. Giringi ew e, ku berhema romanê li ku derbas dibe, şexs kî ne. B. Nazê : Qesta te naverok e?

M. Uzun : Belê.

B. Nazê : Yekî İngilîzî li ser Kurdistanâ romanekî nivîsiye mirov kare jê re bêje roman kurdî?

M. Uzun : Na... Pivan adet, tore û naverok e. Her kes bi zimanê xwe nanivise, lê nivîskarê mîletê xwe tê naskirin. Ji ber van sedeman bi zimanê xwe nanivise: Dîtinê xwe nikare bi zimanê xwe binivîse; nivîskar dixwaze zedetir belav bibe (bêtir bêt naskirin); dixwaze bi zimanê internasyonalî binivîse. Li Tirkîyê gelek kes hene bi tirkî dinivîsin, jî ber ku nikarin bi kurdî binivîsin. Yaşar Kemal di gelek roman û eserên xwe de tore û adetên kurdî bi kar anîye.

B. Nazê : M. Uzun dibêje....

Malmisanij : Edebiyat ci ye? Hunermendiye. Huner mendî ya ku girêdayiyê ziman e. Pivan ziman e. Wek M. Uzun dibêje, li gor naverok be mirov qikare ji binî derkeve. Ew çax yekî fransiz romanekî li ser kurdan nivîsiye, gava mirov li naverokê binêre nabe. Mirov van nivîskarê kurd jî bihesibîne, lê nabe edebiyata kurdî. Yaşar Kemal ne nivîskarê kurd e.

F. Şakîlî : Ev mesela kolonîyalîzmî ye. Hindistanî bi İngilîzî nivîsandiye. Mesele ne şexs e, mesele edebiyat e. Li hîn perçen Kurdistanâ bi erebî, farisi û bi tirkî tiştîn nivîsandin, em karin bêjin ew edebiyata kurdî ye? Na!

R. Zilan : Mesele ci ye? Nijad e, an nivîsandine? Ziman esas e.

## ÇEND PIRS Û BERSIV

Bavê Nazê, dawiya panelê ji guhdar û nêrevanan re da diyarkirin û rê da yê ku pirsên wan hene. Zinar Xamo heqê peyvê girt û pirsî:

— Ez ji M. Uzun dipirsi te got ku zaravê kurdî ne zimanê edebî ye. Gelo tu çiqas kurmancî dizanî û di derheqê kurmancî de ci xebata te heye?

M. Uzun : Ez çiqas kurdî dizanîm di destê min de qet pîvanek tune. Min bi tirkî xwendî ye. Qesta min di zimanê kurdî de klasik hene. Lê ev kevn in. Ne modern in. Zimanê modern tune. Ziman li paş maye.

F. Şakîlî : Kurmancî 200 sal rawestaye, ev jî, ji ber sede-men siyasi ye. Soranî di sala 1850 yî de hatiye nivîsandin.

# JI FEDERASYON Û KOMELËN

## ENDAM NÛCE Û BÛYER

### komcivînê komelan

#### KOMELA KURD LI UPPSALË

##### KOMELA KURD LI STOCKHOLMÊ

Komîta amadekara Komela Kurd li Stockholmê, di roja 04.01. 1986 an de li Stockholmê komcivîna xwe ya yeke-mînpêk anî. Komîta Amadekar heta roja kongrê 120 endam qeyd kiri bû. Lê Şêst û sê (63) kes besdarê kongrê bûn.

Serokê Komîta Amadekar, bi axaftineke civinê vekir. Dîwan hat hilbijartın û rojeva komcivîne hat pejrandin. Raporên Komîte yêñ xebatê hatin xwendin. Û munaqêşê li ser raporan çêbû.

Destûra nû ya ku ji aliyê Komîta Koordîne ve hati bû amadekirin, bi hinek guhartinê biçûk hat qebûlkirin. Organên komelê yêñ nû û nûnerên federasyonê hatin hilbijartin.

##### KOMELA KURD LI SPANGAYÊ

Rojek li pey konga Komela Kurd li Stockholmê, yanî di roja 05. 01. 1986 an de Komela Kurd li Spangayê kongra xwe pêk anî. Komîta Amadekar heta kongrê ji sedî zêdetir endam nivisandi bû. Piraniya endaman di kongrê de besdar bûn. Xebatê Komîta amadekar, ji kongrê re hat pêşberkirin. Li ser kar û bar axaftin çêbûn. Bi hinek guhartinan destûra nû hat qebûl kirin. Organên komelê yêñ nû hatin hilbijartın û nûnerên Federasyonê hatin tespît kirin.

##### KOMELA ÇAND A KURD LI BOTKYRKA

Komela Çand a Kurd li Botkyrka, di roja 12. 01 1986 an de di salona komelê de kongra xwe çêkir. Wek xwendevanen Berbangê jî pê dizanin, ev komelê ji mêt ve komeleke gepemperi bû. Li gor sisteme belediyan ava bibû. Lê belê Komeleke gelek jar û qels bû. Di sala dawî de komelê xebateke gelek bizave da pêşîya xwe û bi serket ji. Di pey biryara Federasyonê de, komîta karger hejmara endamên xwe derxist 96 an. Lokal dît û dest bi xebateke gelek çak kir.

Komcivîna komelê bi 53 kesan destpêkir. Komîta karger raporên xwe pêşkesî kongrê kir. Li gel û li dij rapor an axaftin hatin kirin. Komîta kevn hat rûspikirin. Destûra Komîta Koordîne di vê de ji bi hîn guhartinan hat qebûlkirin. Ji bo pêş daxwazû pêşniyari hatin kirin û biryar hâyin girtin. Komcivîne ji bo hilbijartina organan û nûnerên Federasyonê hilbijartîn pêk anî. Komela Çand a Kurd li Botkyrka bi 5 nûnerên xwe ve dê besdarê kongra Federasyonê bibe.

Di roja 22 . 12. 1985 de kurdêñ ku li bajarê Uppsalê dijîn di bin sîwana komeleke de komcivîna xwe ya yekemin pêk anî. Berî li bajarê Uppsalê komeleke kurd û komîteke ji kurd û tirkêñ pêşverû yên ku li bajarê Uppsalê dijîyan hebûn. Di pêş biryara federasyonê ya ku " di her bajarêkî de komeleke kurd bêt avakirin" de ew komele û kurdêñ ku di nav komîte de bûn; hatin ba hev û komîta amadekar ava kîrin M e wê bûyer û biryara ha di hejmara Berbangê ya 5/85 an de di rûpela 12 an de bi navê " Biryar û Belge" dabû.

Komîta amadekar, di warê demokratîk de ji bo yekîtiya kurdêñ ku li bajarê Uppsalê dijîn, xebateke bê westan da pêşîya xwe û karûbarêñ heja kir. Xebata komîte

fikiyên xwe da. Di vê roja ha de komîte komcivîna xwe ya salewextî pêk anî. Di civinê de ji 170 kesî bêtir endam peşdar bûn. Li gor rojeva kongrê, raporên xebatê hatin xwendin. Munaqêşê li ser raporan çêbûn. Ji bo pêş û ji bo pişaftina pirs û pirsgirikêñ civata kurd li Uppsalê daxwaz û pêşniyarf hatin pêşkeskirin. Organên nû hatin hilbijartın. Komela Kurd li Uppsalayê ji bo besdarbûna komcivîna Federasyonê 15 nûnerên hilbijart.

##### KOMELA KURD LI BOLLNÄS

Kurdêñ ku Bollnasê rûdinîn, biryara Federasyonê baş dîtin û dest bi avakirina komela kurd kirin. Di roja 27 ê meha 12 ê 1985 an de komcivîna xwe pêk anîn. Destûra ku aliyê Komîta Koordîne ve hatibû çêkirin, bi hîn guhartinê biçûk pejrandin. Komcivîne organên xwe hilbijart û ji bo besdarbûna komcivîna Federasyonê nûnerên xwe hilbijart.

##### KOMELA KURD LI SÖDERHAMN

Kurdêñ k u li der dora Söderhamnê dijîn, dest bi avakirina komela kurd kirin. Di pey xebateke dûr û dirêj de di roja 20. 01. 1986 an de komcivîna xwe berhev kirin. Komcivîne li ser problemen der dora xwe gûftego vekir. Destûre pejiran û organen xwe hilbijart. Ji bo besdarbûna Federasyonê nûnerên xwe hilbijart.

##### KOMELA KURD LI JÄRFELLA

Komela Jarfellayê ji xwe ji berê ve li gor sisteme belediyan hatibû avakirin. Li pey biryara Federasyonê destûra xwe guhart û destûra Komîta Koordîne qebûl kir. Ji bo besdarbûna Federasyonê nûnerên xwe hilbijart.

# ROMANA 'TU,

A. Fewzi

Di nav weşanen "DENGÉ KOMAL" de romana M. Uzun derket. Bi derketina pirtükê re gelek rexne lê hate kiran.

Ev rexne ji ewkî rexneyen din (tenê di nav dostan de) ne bi awakî zanistî û edebî bes bi awakî kurtepist tê kiran.

"Kî nivisandî ye? Mehmed Uzun, Na lo! ew li ku derê, nivîsandina romanen ku ..."

Ji xwe adeta me kurdan ji berê ve ev e. Çaxa ku em li ser tişteki dîtinên xwe bidin diyarkirin, berî ku këmasiyen wî tiştî bibînin, wî tiştî bilind dîkin, mezîn dîkin, pesnê wî didin. An ji fêda wî tiştî nayîn ber çavan, wî rezil dîkin û qîmeta wî tînin pênc kurişen tirk.

Weki hemû xwendevanen kurd ji dizanin (bi taybetî xwendevanen Kurdistana Bakûr) ku di desten me de pirtük nîn in. Li Tirkîyê weşanen Ö. Yolu du pirtükên kurdî, ya A. Xanê û Ereb Şemo çapkiribû. Pişti salen 80 yî çend pirtük û diwanen Cigerxwin ketne desten xwendevanen. Yanî em dikarin bêjin, ku pirtükên kurdî (roman, çirok, helbest û hwd) yênen henin, bi tiliyîn destan tene hejmartin. Di vi warî de edeba me geleki feqîr e. Tiştekî nîn e, ku em bixwinin.

Herçî yênen din diwanen A. Xanê û Meleye Cizîri ji heye niha ji tipen erebi nehatine wergerandina tipen latinî. Ji xwe berê haya me ji wan diwanen ji tune bûn. Di vi warî de bila "xwedê" jê razî be Prof. Qnatê Kurdo pirtukek bi navê "Tariha Edebiyatâ Kurdi" nivîsand. Em ji helbesten klasik ên kurdî agahdar kiran Me, ev helbesten xweş ji devê mele û feqiyen kurdan dibîhist.

Her çiqas çend hozanan di warê helbest a modern de dest bi xebatê kiri bin ji, hêj helbesten modern ê kurdî di nav edebiyata me de baş bi cih nebûye. Helbest, çirok û pêkenînê me di dema A. Xanê û Mele Cizîri ûhwd de maye. Tevi ku ew dem bîhurtiye, lê hebûna edebiyata me, di wan çaxan de maye.

Bûye deh sal ronakbirêñ kurd bi tirs û dudilî ji be gavêñ nû davêjin. Divê xwendevan û rokanbirêñ kurd baş bala xwe bidin, xebatêñ wana. Dîtin û rexneyen xwe bi awakî zanistî û edebî bigrin. Këmasiyen nivîskar û ronakbirêñ xwe nişan bidin. Nivîskaren xwe teşviq bikin. Bila nivis-

kar û ronakbirêñ me ji, cesaretê bistînin û bikevin meydana xebata edebî, da ku çand û edebiyata gelê me yê bindest winda nebe, pêşkeve.

Ma heyâ kengê em dê pirtükên F. Baykurt û Y. Kemal bixwînîn? Ü ideolojiya çewt ku di nav rûpelên pirtükên wan de veşartî, bê hemdê me bikeve mêmüyê me.

Em dê disa vegezin mesela xwe. Rexnegirêñ me: "Zimanê kurdî ne gîhaye wê pêpelokê (merhelê) ku em bikaribin romanen pê binivîsinin", "divê em weki çirokên kurdî yênen kevn binivîsinin", 'M. Uzun di pirtûka xwe de jiyana xwe aniye ziman, ev ji quretiye." Hin ji dibêjin "Çiqas këmasiyen wî hebin ji gaveke pêş e û baş e."

Bi dîtina min romana TU ya M. Uzun, di nav edebiyata kurdî de û bi taybetî di warê roman de gaveke nû û pêşketineki hêja ye. Ji ber ku; nivîsandina romanen di zimanê kurdî de ji xeynê Ereb Şemo (wî ji uslubê çirokên kurdî ya bi devikî bikaraniye.) kes tune ye. Romana kurdî bi pirtûka M. Uzun, gîhaye pêpelâkeke nû û modern.

Rexneyen min yêñ baş ev in, ku ronakbirêñ me yêñ nûhatî ji dikarin romanen binivîsinin. Di nivîsandina romana kurdî de motifên kevn yêñ kurdî û uslubêñ modern yê edebiyata dinê istifade bikin, digel hev kar bînin.

Di romana TU de hîn tişt ji henin, pêwîst e, ku li ser wan munaqesen edebî bêñ vekirin. Ew ji li gor dîtina min ev in: Zimanê TU çawa ye? Fantazî û bûyeren di romanen de bi hev ve baş hatiye girêdan, an na? Fantaziyên wî gelik in, di ciyêñ xwe de ne? Ma bi nivîsandina pirtükê, M. Uzun xwestiye xwe meşûr bike? An ji bo quretiyî nivîsiye?

Li gel van pirşan ji, ev pirtük di warê romannivîsen kurdî de, dê rolek baş bilize? Bi pirtûka xwe M. Uzun dikare bibe minakek romannivîsen modern yê kurdî?

Heke xwendevan, li ser vê pirtükê yan ji li ser edebiyata kurdî bixwazin munaqese vekin û bidominin, divê kovara "Berbangê" rûpelên xwe ji wan re veke. Ez bawer im, ku di vi warî de dîtina redaksiyonâ "Berbangê" ji ne dûrê dîtina min e!

## dengê me

Stêreka din li esmanen rojnamegeri ya kurdî ges bû, bi derkeftina hijmara 1 an ji kovara Dengê Me.

Dengê me kovareka edebî û çandî ye. Bi zimanê kurdî-kurmanciya jûrî - ji aliye hinde nivîskaren law li Dihokê - Kurdistana Başûr - derdikeyit û ev kovare ya girêdayê ci dezgeh û rîxistinê resmî yêñ Erâqê nîne.

Li ser sedem û armancen derxistina vê kovare Dengê Me di pêşgotina xwe de wilo diyarkiriye ku kovar û rojnameyen resmî li Erâqê mafe wan windakirine û dergehêñ xwe ji efrandinê wan re venakin; lewra van nivîskaran pêwîst dît ku ew bi xwe erkê derxistina kovareke dey-nin ser milen xwe û bi vi karî rabin. Dengê Me disan di pêşgotina xwe de soz daye, ku berdewam kovara xwe derxin û xwe bi ci dezgeh û rîxistinê resmî ve girê nedîn. Di dawiya pêşgotinê de gotine. "Hîvîdarin bi vi karî biçûk bi bişeyn bikarîn xizmeta peyva kurdî bikeyn û dilsoj û xwendevanen kurd razî bikeyn."

Dengê me 98 rûpel e. Ji gewarê navîn û li çapxana "EL HEWADIS" li Bexda hatiye çapkirin.

Li navbera bergê pêşîn û paşîn ev babete bi ber çavêñ mirovi dikevin: Rexne û karê rexnegirî - Pêzanê Alixanî - Yılmaz Guney - İsmail İbrahim - helbestvanê ayînî "Mela Xelîle Serfi" - Mesod Botanî - Sê Helbest... Ji bo te ye müşextiyê - Ebdilayê Cindî, Cirfek - Hizirvan û Sor gula min nepiş kivi - Kerîmê Bîyanî. Du çirokên Mehemed Emin Borzaslanî, Segvan Yusîfî ji elfabeya latîni wergerandî elfabeya erebi. Ferhengokek ji bo zarokên kurd erebi-kurdî. Çirokeka Tolostoy ji erebi wergerandiye kurdî. Nivîsarek li ser helbestvanê hevçerx Bedirxan Sindî û helbesteka wî. Samî Silêman Hacî çirokeka Yaşar Kemal bi navê "Tehre" ji erebi wergerandiye kurdî û pêşgotinek li ser nivîsiye. Li dawiya kovare Dr. Nîfî Akreyî serokê êketiya torevan û nivîskaren kurd nameyeka pîroz-bahiyê jê re şandiye.

Bi navê Berbangê em pîrozbahîya nivîskaren "Dengê Me" dikîn û daxwaza berdewambûn û serketinê jê re dikîn, hîviya me ew e, ku Dengê Me deng û hawara gelê me bit!

# ji helbestvanê kurd

muéyid teyib

## EHMEDÊ NALBEND

Sadiq Beha'ddîn Amêdî, yek ji ni-vîskarê destê pêşin e. Li Kurdistanâ Başûr yênu ku bi zimanê kurdi — kurmancî — dinivîsî Amêdî gelek şareza-yê ziman û tûreyê edebiyat- klasîkê kurdi bûye û bi sedan nivîsar, vekolîn û tûjandin kirine, demekê ne yê kurt ders li zanîngeha Bexda - beşa kurdi - gotine û gelek pirtûkên bihagiran çapkirine. Amêdî, sala 1984 ê ji nav gelê me barkir. Piştî xebatek dûr û dirêj di warê ziman û tûreyê kurdi de kirî, bi çûna Amêdî valahiyek mezin kete qada nivîsin û vekolînen tûreyê kurdi. Lê Amêdî, bi dirêjiya jîna xwe xebat kir û xebata wî di vê meydanê de xizmetek mezin gehande edebyata kurdi û berhemekê pir bi nîrx li pey xwe hişt. Gelê me xebata wî ji bîr nakît û rîka wî vekirî bernadît. Ji pirtûkên giranbiha yê Amêdî yêna çapkirî ev in:

- \* Dîwana Meleyê Cizîrî
- \* Dîwana Pertûyê Hekarî
- \* Nûbihara Ahmedê Xanî
- \* İdyemêt Kurdi
- \* Rêzimana Kurmancî — Grametîk—
- \* Hozanvanê Kurd (1)

Hozanvanê Kurd, sala 1980 yê ekadîmiya Îraqê — desteya Kurdî — çapkirîye. Li ser jîn û efrandinê 19 helbestvanê kurdi yêne kevn û nû — mebest ji kevn û nûyatiyê demê jîna wan e — Ji hêjî gotinîye ku ev her 19 helbestvanê kurmancî in an ku bi diyâlî kta kurmancî ya jûri nivîsine. Kitêba "Hozanvanê Kurd" bi tipen erebî çapbûye, lewra ji kurdê Kurdistanâ Bakûr karekê giran e, ku bikarin bixwînin. Êdî min pêwîst dît ku ez bi kurtî li ser jîn û efrandinê wan helbestvana binvîsim û bi xwendevanê Berbangê bidim nasîn. Ji van helbestvanan hene yêne ku helbestanê wan bi tipen latîni çapbûyne û di navdarin li her çar perçeyen Kurdistanê, lê hene jî ku efrandinê wan bi yekcari ne hatine weşandin, yan bi tipen erebî bi tenê hatine çapkirin.

Helbestvanê ku navêne wan di vê kitêbê de hatin ev in:



Ebdilsemed Babik, Meleyê Cizîrî, Feqê Teyran, Elî Herîrî, Sêx Xiya-seddîn Neqşebendî, Mela Mensûrê Girgaşî, Xalid Axayê Zêbarî, Mela Hisenê Bateyî, Exmedê Xanî, Pertûyê Hekarî, Bekir Begê Erizî, Sêx Nûreddînê Birîtkî, Sêx Tahayê Mayî, Husniyê Bamernî, Enwer Mayî, Tahîre Şûşî, Ehmed Eminê Nalbend, Tahîre Rûşdî û Sêx Memdûhê Birîfkî.

### EHMEDÊ NALBEND

Ehmedê Eminê Nalbend, li sala 1890 ê li gundê Bamernê — devera Behdînan — ji dayîk bûye. Ji maleka hejar, bavê wî nalbendî dikir. Nalbend weki her zarokekê kurd li wî demê ye ku xwîndingeh ne bûn, dest bi xwendina Quranê kirîye, li cem dayika xwe di jîyê şes salî da, piştî xwendina Quranê dawî anî dest bi feqetiye kir, li cem gelek melayen şareza di wî demî da heya sala 1916 ê şahada melatiyê wergirt bû mela.

Nalbendi, melatî li gel gundên deve-ra Behdînan kirîye. Bûyerêن pir teng û res di ser de hatine, dema leşkeren kolonîyalistên Ingilis li destpêka sed saliya bîstê Iraq û Kurdistan dagirkirî. Xelkê deverê dijwarî, berhingarî leşkerê ingiliz bûn û şerên mezin li devera Behdînan çêbûn weki şerê navdarê Geliyê Mizûrka sala 1919. Nalbend, mirovekî welatparêz û ji çîna hejar bûye, hemî dema helwêstê wî di gel gel û çîna wî bûye û di helbestanê xwe de gazi gelê xwe dikit, ku ji xew şîyar bibit û xebatê bikit ji bo azadî û rizgariyê.

Nalbend, di jîyê "12" salî de dest bi fehandina helbestan kirîye. Helbesta nalbendî di dariştin xwe da klasik e. Ü di wêne û babetên xwe de romantîk û gelêriye. Hemû babet û alyîn jînê hembez kirine wek, welat-parêzî û berxwedana gelê kurd dijî Ingilizi û leşkeren Îraqê, evînî, pesna siroşti, henek, oldarı, hî rewîstêne kurda, hêriskirin, heta dawî...

Demê şoreşa mezin a 11 ê Îlonê li sala 1961 ê destpêkî Nalbend li devera Bamernê bû, li wêr şerên dijwar di navbera leşgeren dagerkeren Îraqê û pêşmergeyên gernasen Kurdistanê çêbûn, gelek gund talan bûn û bi hezaran xort, jîn û zarok şehît bûn û derbeder bûn. Vê çendê karekî mezin li Nalbendî kir û bi dehan helbest nivîsin. Li roja 9 ê Îlona 1963 ê Nalbend ji jîna xwe bê zar bibû li gundê Xişxaşa bi kereka tûj zikê xwe ve kir û xwe kuştı.

### XWEKUŞTINA NALBENDÎ

Li ser xwekuştina Nalbendî, xelkê deverê wilo vedgirin:

Ew sê-çar roj bû, Nalbendî kereka mezin peyda kiribû û herê mijûl bû bi hisûna wê ve, dema xelkê gundî jê pirs dikirin "ew ci kere di destê te da?" Bersiva wan dida : "Lezê nekin dê zanin." Rojekê şev bi ser gundi de hat, Nalbend venegeriya, roja paştir xelkê gundi lêgeriyan dîtin va

ye Nalbend li ser kaniya gundî xwe kuştiye.

Çima Nalbendi xwe kuşt?

Hindek dibêjin Nalbend dawiya temenê xwe dîn bibû. Hindek dibêjin hindî Nalbendi jin û zarokênu kuştu dîtibûn di hêrişa reşa leşkerê faşistê Iraqê li ser Kurdistanê sala 1963 de û dilê wî yê mezin û çavênu wî hew dikarin van bûyeran hilgirin û bibînin, êdi xwe kuşt.

Lê bi rastî ev gotina gel di sade û ji rastiyê di dûr in, xwekuştina Nalbendi gelek ji vê çendê kûrtir e û betivî vekolîneka dirêj a psikolojî ye, li ser jîn û helbesten wî, cihê vê yekê di vê nivisarê de nîn e. Paşê bi sedan helbestvan û hunermendên mezin li cîhanê xwe kuştine û ez bawer nakim hemî dîn bibûn.

Nalbend, helbestvane û pirnîvîs bû.

Bi sedan helbest nivisîne û hejmara dîwanen wî ji dehan pirtir in. Lê ji ber sansûra rejêma faşîst a Iraqê heta niha nehatine çapkirin, ji bilî sê dîwanan û çend helbestek rojname û kovarê kurd li Kurdistanâna Başûr.

Helbesten Nalbendi gelek belav bûyîne di nav xelqê devera Behdînan de û tû kes nîn e, ku navê Nalbendi nebîhîstiye; herwisa piraniya mela û feqêن Behdînan helbesten wî ji ber dixwînin.

## du helbesten nalbendi

### AX Ü FIXAN

Ax û fîgan evro ke ne  
Emrê me bûrî b' teşqela  
Eş û elem pişka me ne  
Daim bi eşqê muptela  
\* \* \*

Daim bi eşqa dîlberê  
Keftîme çerxa xincerê  
Ku ji muhbata reng esmerê  
Dîn bûn du sed şêx û mela

\* \* \*

Gerden ji qendilê vedâ  
Şul'ê şefeq da ser heda  
Yareb ci nîmet bû te da  
Fecra seher bû me cela

\* \* \*

Dêmê şîrînê sor û zer  
Bisk û kezî berdane ser  
Evro helat fecra seher  
Bilbil didin bang û seda

\* \* \*

Bang û selam dan bilbila  
Meşiyane nav baxê gula

Seyr û temaşa sunbîla  
Erzan kir ev sala xela

\* \* \*

Dîlber ji rengê şîseye  
Soret gula bê perdeye  
Dîtna rwiya hecameye  
İhram me bestin ewela

\* \* \*

İhram me bestin van dema  
Çû müddeyê eş û xema  
Qelbê hezin xem tê nema  
Lew defebûn kerb û bela

\* \* \*

Xala li dêmê pir şeref  
Alem hemû li rex bûne sef  
Hatin temaşa çar teref  
Nûr hate şîklê ey gela

\* \* \*

Baran xunafe li ser ruya  
Barî hemî li deşt û çiya  
Gul xivkirin şîn bû giya  
Xweş bû bihara l' ber çela

### CÎHÊ KURDAN

Xoşe wekî cennetê  
Ev cihê Kurdan yeqîn  
Qabîle bû lezetê  
Germ û nerm û baş û hîn

\* \* \*

Mêrg û çîmen, cûm û av  
Reweneq û zax û hetav  
Sal û meha gav bi gav  
Mu 'itedîl û her bijwîn

\* \* \*

Tazeye lê xoş bihar  
Bax û rez û dar û bar  
Cûrê kulîka hizar  
Gav û dema sor û şîn

\* \* \*

Zwîr û gir û bin tiraş  
Hindî bê jî xoş û baş  
Libsê çiyay her qumas  
Dîlveker û nazenîn

\* \* \*

Kêrî û şîv û nehal  
Sergir û dahl û rewal  
Kehnî û avêz zelal  
Sar, sivik û tam şîrîn

\* \* \*

Deşt û nizar û beten  
Bêhna beheşte diden  
Kê heye ho xoş weten  
Kamile dinya û dîn.

# FERHENGOKA BERBANGÊ

B

Berê<sup>1</sup>: Hêja, delal  
 Berhev : Musabeqe yarışma  
 Bişeyn : Bikarîn  
 Büyer : qewmandin, olay

C

Cigir : Yedek, alikar

Ç

Çavdêr : Kontrol, denetleme

D

Deng : Rey, oy  
 Dahat<sup>ü</sup> Rojêñ pêş, gelecek  
 Destur Tûzûk, nizamname  
 Dagerker : İşgalkar

Divayî : İmkan

H

Hejar : Zeyif

K

Komîta karger : Komîta idare,  
 Komîta Çavdêr: K. Kontrolê  
 Kongra awerte: Kongra ıstîsnayî  
 Karbidest : Zorba, İktîdar

M

Maf : Heq

N

Navendî : Merkez  
 Nûçe : Xeber

P

Panel : civîna bi munaqşe

O

Qad : Çarmedor, alan

R

Rojnamegerî : Karûbare rojnameyî

Ş

Şirove : komuntar, yorum

T

Temen : Emr, sal, yaş  
 Tûjandin : İfade girtin

V

Vatinî : Wezîfe

W

Wêne : Resîm

X

Xweza : Tabîî

## daxuyaniyek

Federasyona Komelêñ Kurdistanê, dê di navbera rojêñ  
 01 – 02 . 03 . 1986 an de, li xaniyê ABF ê ya li Sveav.  
 41 de saet ji 09 an heta 16 an du roj li ser hev kongra xwe  
 pêk bîne. Hemû komelêñ endam û kurdêñ welatparêz  
 vexwendiyê kongrê ne.

Bi silavêñ germ û şoresgerî!

**K. K. F.**

li Hollandê

NAVENDIYA

KURDISTANÊ

vebû



Kurdên ku li Hollandê dijîn, ji mêt ve ji bo yekîtiya kurden li Holandayê xebateke dûr û dirêj didomandin. Di dawî de gehîstîn encameke ( netîceke) çak û pêşketî. Xebata wan ya hêja fîkiyên xwe da. Kurdên li Holandayê Komîta Navendiya Kurdistanê pêk anîn.

Komîta Kargêra Navendiya Kurdistanê di roja 11. 12. 1985 an de bi civineke serketî û serfîraz, Navendiya Kurdistanê vekirin. Di vekirina navendiya Kurdistanê de, gelek hêz, parti û rêxistinê Holandî û bîyanî besdar bûn. Wek ku di fotografê de ji tê dîtin serokê belediya bajarê Arnhem kordela Navendiya Kurdistanê dibre û lokala Navendiyê vedike.

Ji endamê Komîta Kargêra Navendiya Kurdistanê, di axatina xwe ya vekirina lokala Navendiyê de, ji bo holandiyan weha digot:

" Li derveyî welat, li Ewrupa kurd, tirk, ereb û ecem dihat hesibandî. Piştî xebata kurdan li derveyî welat da hatiye çêkirin, êdî kurd bi navê xwe têne hesibandin. Li Holandayê kurd hê ji resmî nehatine naskirin. Lê belê bi xebatê roj bi roj kurd, di nav gelê holandî de têne naskirin û gelê holandî ji kurdan neteweke serbixwe dizanin. Di nava belediyen holandî de kurd ji yek ji wan bîyanîyan êdî têne hesibandin Her wekî di belediya Arnhem de ji iro êdî kurd têne naskirin. Ji ber vê yekê û ji ber xebata me û bi amadekariya belediya Arnhamê, kurd gehîstîn yê Navendiyê...."

U ew heval di derbarê xebat û avakirina Navendiya Kurdistanê ji, di eynî axaftinê de ji kurdan re ji weha xitab dikan:

"Geli hevalbendêñ kurd!"

Wek tê zanîn ji 1980 yî vir de xebata ji bo Navendiyê Kurdistanî li Ewrupa hate xuyakirin. Li Ewrupa Rojava gelek komel û navendiyen çandî hatin damezrandin. Di 1982 yan de ji, li bajarê Arnhem bi çend welatparêzen kurd xebata ji bo Navendiya Kurdistanî hate çêkirin. Ji 1982 yan vir de bi taybetî di nava 1984-85 an de ji bo Navendiya Kurdistanê gelek kar û barêñ giran çend hevalen dilsoz domandin. Iro vê xebata hanê gehîstîye wareki damezrandinê. Em bi navê NAVENDIYA KURDISTAN spasê hemû hevalen xebatkar û spasê serokê belediya Arnhem û evêñ ku alîkariya wan gîhiştiye xebata Naven-

# Burgemeester opent Koerdisch Centrum

12-12 1985 ARNHËMSE Koerier



diya Kurdistanê dikan."

Vekirina Navendiya Kurdistanê di gelek rojnameyên Holandi de cî girt. Ü di roja 14. 12. 1985 an de ji komîta Kargêra Navendiya Kurdistanê, belavokek belav kir. Komîte di belavoka xwe de weha gazî hemû kurdên li Holandayê dikan:

" Navendiya Kurdistanê li Arhemê û li der û dora Arnhem jî temamê hêzên welatparêz û demokratik û ji her kurdeki welatparêz re ji bo xebatê vekiriye. Ew mala ci-vata hemî kurdên niştîmanperwer e. Navendiya Kurdistanê di warê demokratik de bi hevkariya komelan pêk hatiye. Komîta me pê bawer e, ku her komelêñ li ser bingehêñ demokratik ava bûne divê di Navendiya Kurdistanê de cî bigre."

Em Navendiya Kurdistanê piroz dikan û ji wan re serketin û serfîrazî dixwazin!

li ser wêje û ziman

PANELEK

Mesele bi ziman ve ye. Niha li Iraqê çend kes hene ku bi soranî dinivisin; lê ew ne soranî ye. Kurmancî û soranî ye. Kurmanciyeke nû ye. Ji bo yekîtiya ziman gelek baş e. Ş. Cizîri : F. Şakîlî got ku her kes bi zimanê dê û bavê xwe dipeyîve û dinivise. Mirov bi zimanê dê û bavê xwe nepeyîve, bi ci bipeyîve? Wî ji vê yekê re ci rê ditiye? F. Şakîlî : Em bahsa zimanê nivîsandinê dikan. Ev giring e. Li der ve azadî heye. Çima ronakbîren kurd fêri soranî û zazakî nabin? Bila fêr bibin. Lê li Ewrupa ev azadî û imkan hene. Yêñ ku her sê zaravan (diyalektan) nizanîbin, nikare bêje ez ziman û edebiyata kurdi dizanim û xwedîyê gotin û biryar im.

Wexta girtina salonê tije bû û dawiya civînê hat.

ADRESS/NAVNIŞAN:  
RISSNELEDEN 55,NB  
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN

NİSTİMAN

